

# POPKURD

06/2021 • Jimar 9

e-Kovara Çanda Populer

“HEWCE YE EM JI BO  
YÊN PIŞTÎ XWE RIYEKE  
NÛ VEKIN”

## AYNUR DOĞAN

POPPIRS: NÛVEEN BARWARÎ



KURD LI PARÎSÊ - Mistefa Çelebî



DI EDEBIYATA KURDÎ DE DENGÊ JINAN



Merheba xwînerên delal ên Popkurdê. Em bi hejmara xwe ya 9emîn li pêşberî we ne. Di vê hejmarê de Leyla Ozkaplan jî tevli edîtoryaya me bû. Heta ji me hat me xwest naverokeke rengîn ji bo we deynin. Em hêvî dikin ku kêfa we jê re were. Hûn dikarin bi riya e-mail an jî hesabên me yê medyaya sosyal, hemû fikr, pêşniyaz û rexneyên xwe ji me re bêjin.

POPKURD  
e-Kovara Çanda Populer  
06/2021 • Jimar 9

**Edîtor**








Mistefa DOGAN  
Ömer SÖNMEZ  
Leyla OZKAPLAN

**Bergsazî**

Ridwan XELÎL

**Rûpelsazî**

GrafîKURD

	+90534 325 3629		popkurdkovar		
	PopKurdKovar		PopKurdKovar		popkurdkovar@gmail.com
	popkurdkovar.wordpress.com		channel/UC7OVendzXoCAzJC2wf_KVYw		


# NAVEROK



**RIHLETGUZÎN | Îtalya**  
Mihemed BÎLEN |04



**Me Ji 10 Kesan Pirsî**  
Popkurd |36



**“TIRŞIK”A ME TIM DIKELE**  
|10



**Clubhouse:**  
**Şevbihêrkên Modern**  
|41



**GELO WE DIZANIBÛ?**  
Popkurd |16



**POPPIRS**  
**Nûveen Barwarî**  
Popkurd |44



**ROPORTAJ**  
**AYNUR DOĞAN**  
Leyla Ozkaplan |18



**Di Edebiyata Kurdî de**  
**Dengên Jinan**  
Popkurd |46



**PODCASTARÊN KURD**  
**DIPEYIVIN**  
Popkurd |24



**EM Û BOTOKS**  
Dr. Rodî Zanyar |53



**MESELE GIRAN E**  
Popkurd |32



**Les Kurdes de Paris an jî**  
**Kurd li Parîsê**  
Mistefa Çelebî |55



# EATALY ANGO ÎTALYA: WELATÊ ÇÊJ Û HUNERÊ



**RIHLETGUZÎN**

Mihemed BÎLEN

mehmetihsanbilen@gmail.com





Yek ji wan welatên Ewropayê yên ku mirov dikare li hemû bajarên wê bi kêfxweşî bijî Îtalya ye. Venedîk, Mîlano, Napolî, Torîno, Palermo, Genova, Bologna, Floransa, Verona û helbet Roma... Her yek bi serê xwe xwediyê xuy û xisletên cihêreng in. Ji ber ku li ser mîrata wê şîn hatiye, li hemû deverên Îtalyayê, hûn dikarin pêrgî bermahiyên împaratoriya Romayê bîn. Welat wekî muzexaneyêke servekirî ye. Ev welatê qedîm ê ku bi hezaran hunermend ji bo kelepûra hunerî û kulturî ya cîhanê gîhandine, di roja îroyîn de jî bi gelek berhem û afirandinên ciyawaz ên modern, di vî warî de pêşengiyê dike.

Em li Romayê ne. Li restoraneke bi navê Cantîna e Cucînayê televîzyon vekirî ye, nûçe tîn pêşkeşkirin. Pêşkeşkar behsa vîrusekê dike, li gorî saloxdanan ev pêlek e vîruseke kujer li bajarekî bi navê Wuhanê ku bi ser Çînê ve ye peyda bûye û her ku diçe dipengize welatên derûdorê. Dema ev nûçe tîn pêşkeşkirin antîpastî û pîzzayên

ciyawaz ên hatine ber me em li hev belav dikin û helbet em guh nadin wan “xeberên bêtîbar.”

Berîya em werin Romayê bi çend salan min Venedîk û Mîlano dîtibûn û ez dil ketibûm van bajaran. Li kuçe û kolanên Mîlanoya ku navenda modayê ya alemê ye û Venedîka ku yek ji bajarê herî turistik yê cîhanê ye bêserî geriyabûm.

Wekî herkesî mîmariya katedrala Duomo di Mîlanoyê ya biheybet ku di 519 salan de hatibû lêkirin, ez serxweş kiribûm. Galleria, Katedrala Duomo, kanalên bajêr û xwarîngehên Mîlanoyê cihên herî populer bûn.

Li bajêr di rojekê de bi dehan defîle bi rê ve diçûn. Li ser kolan em pêrgî van defîleyan dihatin ku bajêr dixemilandin. Brendên wekî Zegna, Armani, Versace, Prada, Gucci, Fendi, Bulgari, Valentino li her korziya bajêr dihatin dîtin. Me ji vî bajarê zêde birqonek ê modayê berê xwe da cihokên Venedîkê.





## Saw û kelecana dîtina Venedîkê

Li Venedîkê heftiyek, wekî qurtek ji aveke zelal bû. Herçi mirov bi dehan car di dîmenan de vî bajarî bibîne jî dîtina bi çavan, sawek û kelecaneke balkêş li mirov peyda dike. Heger wekî min pêştir we bajarekî di bin avê de maye nedîtibe, xof û heyecan serê darê ye ji bo we.

Dema em ji trêne peya bûn, keştiyeke seferên nava bajêr li benda me bû. Hata hingê me nedizanî ku seferên nav bajêr bes bi keştî û gondolan tên kirin. 118 girav hene li bajêr û 400 piran, hin ji van giravan bi hev ve girê didin. Meydan û Bazîlikaya San Marco navdartirîn û ezamettirîn meydana bajêr e. Ji vir xwe gîhandina her derê gelek

hêsantir e. Dema em li bajêr bûn festîvala filman ya Venedîkê dest pê kiribû. Ji her aliyên cîhanê bi sedan film beşdarî mihrîcanê bûbûn. Di saeta rê û risma xalîçeya sor de em li wir bûn. Cate Blanchett, Leonardo DiCaprio, Jim Jarmush, Meryl Streep û hê gelek kesên navdar ku niha nayên bîra min li pêşberî me bûn. Min herî zêde kêfa xwe ji Jim Jarmush re anî.

Çi rojên li Venedîkê nedîşibyan hev. Ewqas cihê geryanê û aktîvîteyê hebûn ku mirov yek bi yek nikare bijmêre. Bi ya min yek ji ya herî xweş gera bi gondolê bû. Û helbet fîravîna li gel şeraba spî ya beramberî pira Rîaltoyê ya navdar. Li her derê bajêr maskeyên karnavala Venedîkê ya








rengîn dihatin dîtin. Me jî ji bo li mala xwe daleqînin maskeyek stend.

### Bajarê hunermend û edîban

Du bestekarên bêhempa yên muzîka klasîk Vîvaldî û Albînonî li vî bajarî hatine dinê. Di herdu şahberhemên edebiyata klasîk a cîhanê de jî navê vî bajarî derbas dibe. Ya pêşî çîroka dirêj a Thomas Mann a bi navê 'Mirina li Venedîkê' ye ku Viscontî ew berhem bê qisûr ji bo filmê li sînemayê adapte kiriye. Ya din jî trajîkmediya navdar a Shakespeare a bi navê 'Bazirganê Venedîkê' ye.

Heta roja ku min Roma nedîtibû jî min hebû Parîs, Barcelona, Berlîn, Viyana, London, New York û Stenbol bajarên herî bedew ên cîhanê ne. Piştî dîtina Romayê fikra min seranser guherî. Ya rast berawirdkirina bajar û welat û mirovan ne adeta min e. Lê dîsa jî carinan mirov bi xwe nikare. Geştiyarek dema digihîje nav bajarê Romayê nizane dê berê xwe bide kîjan alî û bergehî.






## Heta mirov rê wenda neke tiştek an cihekî nû kifş nake.

Ji ber ku navend mişt ji berhem û mîmariyên du-sê hezar salî pêk tê, kelecana me her diçe zêdetir dibe, Girê Capiolino, Girê Palatino, Colosseo, Forûm û bi dehan peykerên bajêr me pêşwazî dikin. Berî em bên bi çend rojan bo sê kesan ji Airbnb'ê xaniyekî kirê dikin li navenda Romayê. Ev xaniyê sê jûre ku berê wê li panoramaya bajêr e, rojane bi 90 Euroyî ye. Piştî em di xanî de bi cih dibin, bi awayekî spontan em xwe li kuçeyan diqelibînin. Roja ewil em naxwazin ligel rêberekî an bi nexşeyê dest bi kifşa xwe bikin. Heta mirov rê wenda neke tiştek an cihekî nû kifş nake. Piyên me, me dibin ber Pêlikên Spanyolî. Ev pêlikên ciyawaz ên çarsed salî derdikestin ber dêra Trinita Dei Monti ku ji aliyê mîmar Franchesco de Sanctis û Alessandro Specchi ve hatibûn lêkirin. Ji bo firavîne em xwe naxin rîskê û em naxwazin restorane bi spontanî peyda bikin. Ji Zomatoyê em restorana pîzzayê ya bi rêjeya herî zêde hatiye bijartin peyda dikin. Li Romayê restorana herî zêde kêfa me jê re hat Cantîna e Cucîna bû û hê gelek car em ê biha-

tana vê derê. Sirra pîzzayeke baş di hevîrê têr haveynkirî(hevîrtirş) û di agirê gurr de ye. Heger hevîrekî we yê baş tune be hûn ê nikaribin pîzzayeke baş çêbikin, wisa dibêje aşvanê Cucînayê.

Roja dîtir em berê xwe didin sembola herî navdar a Romayê; Colosseo. Colosseo yek ji heft berhemên nuwaze yên cîhanê ye. Salê pênc milyon kes Arenaya Colesseyê ziyaret dike. Dema em digihîjin ber derî em dibînin ku bi sedan kes li benda ketina hundirê arenayê ne. Wekî herkesî em jî li benda dora xwe dimînin. Piştî du-sê saetan em nêzîkî derî dibin û bi ticketên xwe yên bi 16 euroyî derbasî arenayê dibin. Li beramber vê mîmariya lihevhatî ya du hezar salî devê mirov ji hev diçe. Di heman katê de 55.000 temaşevan dikare beşdarî vê arenayê bibe. Neron ji bo dilê xwe û xelkê xwe xweş bike ev arena daye çêkirin. Teqriben 500 sal li vê derê pîrozbahî, lîstikên şanoyê, şerê ajal û gladiyatoran hatine lidarxistin. Piştî ezameta Colesseyê mirov ne li bendê ye cihekî bi qasî wê bi tesîr bibîne, heta ku Vatîkan û Şapela Sîstineyê dibîne.





## Hecca Mesîhiyên Katolîk: Vatîkan

Roma wekî paytexta du welatan tê hesibandin. Paytexta Vatîkan û Îtalyayê. Her sal bi milyonan mesîhiyên katolîk berê xwe didin Vatîkanê da Papa bibînin û heca xwe bi cih bînin. Vatîkan yek ji bajar-dewletên herî biçûk e. Papa him serokê Vatîkanê û him jî rêberê rûhanî yê mesîhiyên katolîk e. Ezameta peyker û hewşa meydana Ezîz Petrûsê ya Vatîkanê hêjayî dîtîne ye.

Dema Şapela Sîstînayê ye. Bi sedan kes di dorê de ne dîsa. Ji her aliyên cîhanê hatine ji bo şapelê bibînin. Di sedsala panzdemîn de hatiye lêkirin û berhemên herî girîng ê şapelê freskên Michelangeloyî ne. Taybetî freska bi navê Roja Qiyametê mirov bi hêza huner û afirandinê dide hisandin. Ewqas mirov li banê şapelê temaşe dikin ku serê mirov gêj dibe, digel vê yekê mirov naxwaze terka şapelê bike...

Xwînerên ezîz ên POPKURD'ê! Bila ev nivîs li vir biqede lê Îtalya hê neqediya. Belkî di pirtûkekê de ez berdewamiya vê gerê binvîsim...





radyo

Feheng

film

Pirtûk

caps

Yên Din

blbe endam

têkeve

# “TIRŞIK” A ME TIM DIKELE



Malpera tirsik.net (tirşik) ev 8 sal in weşana xwe bēnavber didomîne. Malper ji aliyê naverok û formata xwe ve, ji bo zimanê kurdî bêalternatîf e. Di tirşikê de her Kurdek, di derheqê her tiştî de dikare fikra xwe bîne ziman. Em ji bo kesên ku di tirşikê de dinivîsin, dibêjin tirşikvan. Tirşikvan di nivîsên xwe de dikarin nêrînên xwe yê şexsî jî bînin ziman an jî bi çavkanî û îspatan, gotarên zanistî jî binivîsin. Ev taybetîya malperê rê dide ku mirov bikare di derbarê gelek tiştan de, agahiyên kurdî bi dest bixe. Ev “tişt” dikare peyvek, pirtûkek, bûyere rojane, zanistek, şexsek, filmek, sporek, lîstikvanek, stranek, bawerîyek, îdeolojîyek û hwd. be.

Bi vê rêbaza xwe, tirşik hewl dide ku kurd bikarin li ser înternetê xwe bi zimanê xwe bigihînin her cûre agahî û şîroveyan. Herwiha ev yek rê dide ku mirov hîni pratîka nivîsandina bi kurdî bibin, zimanê xwe dewlemend bikin, devokên xwe nêzikî standartîzasyonê bikin, bi hez-

kirîyên din yê zimên re bikevin tēkilîyê û hevkarîya projeyên dîtir bikin. Jixwe bi saya vê atmosferê ye ku di tirşikê de proje li projeyan zêde dibin. Îro ferehengên tirşikên yê kurdî/îngîlîzî/erebî/tirkî/elmanî heta koreyî/esperantoyî/rûsî di înternetê de yê herî berfireh in. Herwiha di derbarê bi sedan pirtûkên kurdî de agahîyan, wek danegehek pêşkêş dike. Di beşa fîlman de nêzikî 750 fîlm tēn danasîn. Koma wergera fîlman ku piranî ji tirşikvanan pêk tê, heta niha nêzikî 150 fîlmên bîyanî li kurdî wergerandin. Mirov dikare binnivîsa van fîlman ji tirşikê peyda bike. Dîsa radyoya tirşikê ku weşana çawalêhato dike, bi taybetîyên xwe yê nedîtî projeyek gelek taybet û xweser e. Di danegeha tirşikê de bi hezaran kovar û pirtûkên kurdî yê dîrokî peyda dibin. Bi kurtî em dikarin bibêjin ku ji bo kar û xebatên çî cîdî çî keyfî, tirşik platformek bêhempa ye. Ji nav hezaran nivîskarên tirşikê wê 5 hevalên me behsa xwe û tirşikê bikin;





### Bêrîjehr – Tirşik û wergera kurdî ya filman

Min beşa sînemayê xwendiyê, lê piştî ku min zanîngeh qedand li Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê min dest bi perwerdeya rêzimanê kir. Wexta ku ji dersan derdikevim hema min dixwest pirtûkên Kurdî bixwînim. Li qadên jiyane min dixwest nivîsên Kurdî jiyana min bixemilînin. Ji ber vê yekê li ser medyaya dijîtal çend mirovên ku navê wan bi Kurdî bû an jî kêr zêde nivîsên wan di ber Kurmanciyê re derbas dibûn min dişopandin. Çi dinivîsandin ferq nedikir, tenê min dixwendin. Ji ber ku min pir film temaşe dikir carinan wexta di derbarê filman de min nivîsên Kurmancî didîtin bextrew-artir dibûm. Bi salan bi vî awayî kî dihat ber min, min dişopand û min nivîsên her kesî dixwend. Heta ku di rojê sar de rastî nivîseke germ hatim.

Tirsik.net ji xwe re li wergêrên filman digeriya. Min êdî bawer dikir ku ez ê karibim binnivîsa filman

wergêrînim (berî hingî min jî teqez diyalogege filman wergerandibû li ser hesabên xwe yê dijîtal.) . Werhasil, bi salan bû ku ez di pey nivîsên kurmancî de malper bi malper digeriyam, êdî dor hatibû ku ez jî tevî vê govendê bibim û Kurdî li her derî belav bibe.

Di gelek qadên jiyane de kêmasiyên nivîsên Kurdî hene. Sînemaya cihanê jî qadeke ku li kurdî nehatibû zêdekirin bû an jî kêr werger hebûn. Wekî her beşên nû yê ku li zimanê Kurdî zêde dibin wergerên filman jî hem cihê kêfxweşiyekê hem jî cihê kelecaneke bûn ji bo min (Helbet bi vî awayî ji deynê xwe yê nivîsên di medyaya dijîtal de xwendî jî xelas dibim).

Kesên ku bixwazin ev govend geştir bibe bila rahêjin firingî, balîcan û îsotên xwe -rûn ji kîsê me yê û kerem bikin werin. Bi rûniştinê xwarin amade nabe.



### **Cinorek - Pratîka nivîsinê ji xwendinê pir cûda ye**

Ez yek ji tirşikvanên diyasporayê me. Bi navê Cinorek li ser tirşikê dinivîsim. Ev bû 8 sal ku ez li Koreya Başûr dijim. Gava siftê hatim vira welat pir diket bîra min. Loma ez li ser înternetê li nivîsên kurdî, li stranên kurdî pir digeriyam ta ku hebekê êşa xurbetiyê rawestînim. Ew bû sebaba min a rasthatina tirşikê. Tirşik hîn çend meh bû dest pê kiribû. Ez jî hema tevî koma nivîskarên tirşikê bûm. Nasîna tirşikê bo min wisa bû...

Gava dibî tirşikvan siftê bi peyvên tu ji diya xwe hîn bûyî des pê dikî û tirşik te digihîjîne asteke cûda. Beriya tirşikê kurdî zimanê ku min tenê bi diya xwe re diaxivî bû. Loma peyvên min bi kurdî zanîbûn tenê ji peyvên ku diya min digotibûn pek dihatin. Gava min dest bi nivîsandina di tirşikê de kir, min hertim dikir bi devê diya xwe

bifikirim û binivîsim. Lê ew têra min nedikir, ji ber ku diya min ummî bû û peyvên xwe pir kêmbûn. Loma bi kurdî nivîsîn pir zexmet bû bo min. Ji bo nivîsîna tenê hevokekê jî min çend caran ferheng kontrol dikir. Hê jî nikarim bêjim hemû peyvên kurdî hin bûme lê helbet niha ji wê astê baştir im. Ez bawer im hemû tirşikvan wisa difikirin. Sîstema tirşikê wisa ye. Te kiş dîke ku tu xwe bi xwe nivîsa xwe bi pêş bixî.

Hewldana pratîka nivîsinê ji xwendinê pir cûda ye. Bi xwendinê erê tiştek nû fêhm dikî, mejîyê te berfireh dibe lê ew ne peyvên te ne. Tu tenê maneyê fehm dikî. Ji ber ku pratîka nivîsê, peyvên ku ji tûrikê te derketî nîşan dide. Bi her awayî ew peyvên te ne, loma ne tenê bo xwendina kurdî, lê ji bo nivîsê jî lazîm e em hewl bidin.



### **Xwelî li ser -**

#### **-Serboriya Min a Tirşikîrîn**

Wê gavê min wikipediya Kurdî hê nû nas kiribû. Kurdî li hêla çepê di nav zimanên biyanî de ji min re dikir hayho! Min pêlê kir û xwendina kurdî çavên min û mejiyên min kir demûş. Çîroka min a tirşik.netê di 2013an de bi wan çav û mejîyê bikurdî-şêrînbûyî dest pê kir. Bi saya xêrxwazekî min tirşik.net nas kir. Min navek dît ji xwe re û bûm "xwelî li ser." çawa bûm endam, bûm nivîskar jî. Nikarim binivîsim tabî. Hinekê dizanim bixwînim. Min hêdî hêdî kurdîya xwe şêrîntir kir li tirşikê. Meyla min li ser wergerê hebû. berî salekê tirşikê koma wergera filman ava kir. Li wir hezkirina min a sinemayê û wergerê bûn yek. Zimanê min bû şêrîntirîn.

Bi xêra tirşikê li şêrînbûna kurdî serwext bûm. Hevalên min ên jîr û jêhatî çêbûn. Tirşik bandoreke mezintir li jiyana min kir îsal. Bi tirşikê min evîna Kurdî û ya ligel jinekê kir yek. Aqubet li xortên kurdan.





### **Biaqila malê -**

#### **-Radyoya tirşikê min kelecânî dike.**

Di mehên dawî yên sala 2015an de min hê nû dest bi xwendin û nivîsandina Kurdî kiribû. Wisa ser serî li ser qenalên medyaya civakî digeriyam. Blog, Rojname, Twitter, Facebook û hwd. Hema min li kû rûpeleke Kurdî didît, diketimê û min tor serûbino dikir. Rojekê li Twitterê digeriyam, min dît heval danasîna tirşik.netê dikin. Ji ber ku wê çaxê min nizanîbû ferhenga interaktîv çî ye, çî karî dike ewil min fehm nekiribû. Piştî lêkolîneke biçûk ez li hember arşîva tirşik.netê heyirî mabûm û ji ber xwe ketibûm şermê, çawa heta niha haya min ji xebateke ewqas hêja tunebû. Di cîh de min got divê ez jî bibim nivîskar û sûdê ji vê xebatê bigrim. Piştî ez bûm endamê tirşik.netê min jixweber xwest ez Kurdiya xwe pêş ve bibim û berî peyamên xwe binivîsim min her tim seriyek dida ferhenga Tirkî-

Kurdî ya tirşik.netê. Herwiha tirşik.net ji bo min qada yekem bû ku min didît ciwanên Kurdan li ser hunerê, zanistê, olê, wêjeya Kurdî û ya cîhanê nivîsên dirêj dinivîsin, nîqaşên têr û tije dikin. Vê îlham dida min û hê jî dide. Bi taybetî du beşên tirşikê min zahf kêfxweş û kelecânî dikin, ew jî radyoya tirşik.netê û Koma Wergera Filman e. Qet ji bîr nakim carekê min straneke kevn guhdar kiribû li ser tirşik.netê û çiqas geriyam jî min ji tu derî peyda nekir ji xeynî radyoya tirşikê. Qenala telegramê ya Koma Wergera Filman jî xebateke pîroz û arşîveke bêhempa ye li ser qada înternetê. Tehma filmên bi binivîsên Kurdî cûda ye ji bo min. Bi beşên xwe yên pirtûk, fîlm, radyo, capsên Kurdî û bi ferhenga xwe tirşik.net heqê navê xwe dide. Berî her tiştî sedî sed Kurdî ye û ya hemû Kurdan e. Baş e ku heye.



## Biruya Hayao Miyazaki -

### -Gramersûran Frankenstein kirin Benîadem

Tirşik berî her tiştî ji bo min bû xwendegehekê zimên. Berî wê kurdiya min wiha xuya dikir ku mîna Frankensteinê ji gorê hatiye vejandî: tu aheng tê de tunebû, heke hin xisûsiyetên devoka dêûbavên min nehatibaya dîtin, yek dikarîbû yekser bibê-je “ev xerîb e û dû re xwe hînî kurdî kiriye -heta ji destê wî bê!-”. Bi vî halî xwe yê reben, bêyî bertek û alîkariyên civakî min xîret dikir qabiliyeta xwe ya nivîsandinê pêş ve bibim û mixabin çiqas hewl bidim jî ti çêbûneke berbiçav pêk nedihat. Di wê demê de tirşik kete ser dîmendera min a telefonê. Min gelek ferhengên înteraktîf ên zimanê Tirkî nas dikirin û di wan de salên xwe borandibû. Çawa min bihîst formata tirşikê jî wekî wan li ser parvekirina agahî û civakîbûnê ava bûye û bi ser de sedî sed Kurdî ye, ji kêfan firiyam. Wekî xezîneyekê ketibe ber min... Di encamê de piştî ceribeyên salan bi rastî jî kurdiya min baştir bû. Berî her tiştî bi saya wê “ergatîvîte”yê û girîngiya wê fêr bûm, ku hesab li cem we, ka ez di çî astê de bûm! Divê mikûr bêm, ev mesele hîn jî serê min gêj dike lê êdî ne dijminê wê me, mîna salên pêşîn. Heke tirşikvanên “gramersûr û ergatîvîtor” nebûna, dê haya min ji vê pirsgirêka xwe ya mezin tunebûya. Taliyê çend meh berê min wêribû jêrnivîsên çend filman wergerînim.

Li aliyê din, tiştê ku tirşikê ji min re diyarî kir ragihandina “instant” a bi zimanê Kurdî ye. Berî Tirşikê min bixwesta jî, ji xêncî dêûbavê xwe min nikarîbû bi keseke din re bi kurdî bipeyivim, xwişk û birayên min jî tê de. Ev derfeta ku tirşikê anî pêşiya min ji bo min pir watedar e, çimkî rê li ber min vekir ku heqeten jî karibim zimanê xwe vejînim yanî bipeyivim; ji bo dinyayê biçûk bû lê ji bo min gaveke pir mezin bû. Herwiha, berî wê ji xwe min him di rojnivîskên xwe de û him jî di bloga xwe de bi kurdî dinivîsand lê Tirşik berhemanîna dualî ji min re kir adet: nivîsandin û xwendin. Belkî ya herî xweş, sansura navendî tê de tune ye û tirşikvan dikarin qala her tiştî bikin, parve bikin û arşîva xwe ya şexsî pêk bînin û di encamê de dikarin çavkaniyên Kurdî yê li ser înternetê ava bikin. Bi vê jî mirov dikare derheqê xort û ciwanên zimankurdî bibe xwedî fikrekê û heval û hogirên nû nas bike. Bi kurt û kurmancî, Tirşik medyayekê civakî ya 24 eyar e bo kesên zimankurdî.

# GELO WE DIZANIBÛ?



Muzîsyen Mehmet Atli zavayê Muzîsyen Mirady ye



Akademîsyen Mikail Bulbul zavayê şa'ir Seyîdhan Kômürcü ye



Nivîskar û şa'irê rehetî Seyda (Mistefa Gazi), brayê nivîskar û lêkolîner Mehmûd Lewendî ye



Serokê Enstituya Kurdî ya Parîsê Kendal Nezan û şa'ir Rojen Barnas birayê hev in



Edîtorê Kovara Psychology Kurdîyê Sîdar Ozmen Xalê Şa'ir û Wergêr Osman Mehmed e






Lêkolîner û sînemakar Ekrem Yıldız birayê derhêner Selim Yıldız e



Nivîskar, zimanzan û wergêr Mistefa Aydoğan û İbrahim Seydo Aydoğan birayên hev in




Nivîskar Recep Dildar e bavê helbestvan Gulîzerê û çîroknûs Murad Dildar e



Lîstikvanê Yezdan Cewerî kurê nivîskar Firat Cewerî ye



Parêzer Neşet Girasun û Lêkolîner Rojesir Girasun birayên hev in



NOT: Nivîskar İnan Eroğlu nexwest em behsa birayê wî yê navdar bikin!



ROPORTAJ

# AYNUR DOĞAN

“HEWCE YE EM JI BO YÊN  
PIŞTÎ XWE RIYEKE NÛ  
VEKIN”



Roportaj:  
Leyla Ozkaplan


Aynur Doğan yek ji muzîsyenên herî navdar ên kurd e û li cîhanê jî temsîlkariya muzîka kurdî dike. Doğan di vê hejmarê de bû mêvana me. Me jê pirsî, wê jî ji bo we xwînerên popkurdê bersiv dan pirsên me.

Ev demeke dirêj e ku hûn di nav muzîka Kurdî de ne. Bi ya we, jî doh heta îro him di muzîka we him jî bi giştî di muzîka Kurdî de guherînên çawa çêbûne?

Stran-gotin, melodî-çêkirin û nivîsandina gotinên stranan hîsên pirr xweş in û ev di vî karî de tiştên girîng in lê belê herçiqas dengê mirov xweş be jî, rastiyeke heye ku ew jî îcrakirina hunerê ye. Ji bo vê jî hakimiyeta sehneyê û reseniyek divê. Ez bi muzîsyenên cuda re xebitîm. Vê yekê kir ku ez tecrubeyeke teknîkî bi dest bixim û bi perspektîfeke berfirehtir li muzîkê binêrim. Bi saya vê, min fehm kir ku ez ê çawa karibim di nabeyna tarza muzîka xwe û tarzên cuda de têkiliyê deynim û muzîka xwe li ser vê pêş ve bibim. Herwiha min karî ez vê têkiliyê zelaltir bibînim û fikrên nû biafirînim. Yanî ez dikarim bêjim ku bi xêra vê; di muzîkê de min nasnameyek ava kir. Herçiqas performansên sehneyê, tecrube û xwebaweriya mirov zêdetir bikin jî, ew kelecana min a destpêkê ku min tenê bi sazê stran digotin çawa be, îro jî heman kelecana bi min re heye.

Li Tirkîyê, ji bo muzîka Kurdî bi giştî mirov nikare behsa sektorekê bike, muzîka Kurdî hê jî nayê qebûl kirin. Herkes bi hewlên şexsî karên xwe dike lê ev kedeke mezin dixwaze û mixabin ev kes beramberî vê kedê tiştê berbiçav qezenc nakin. Di nav van şert û mercan de berde wamiya vî karî gelek zehmet e. Tevî van hemû zehmetiyên dîsa jî hejmareke cidî ya muzîsyenan heye ku hay ji guherînan hene û dinyayê dişopînin lê ji bo van kesan kategoriyekê diyarkirî tune ye. Lewma di cîhana global a muzîkê de riyekê zor û zehmet li pêş me heye. Zor û zext, qedexa, bêxwedîtî, bêimkanî û bêpergalî... Helbet ji ber van tiştên neyînî mirov nikare qala guherînan mezin bike. Bifikrin ku gelek muzîsyenan ji ber van zehmetî û bêimkaniyan karên xwe berdan heta hin ji wan nikaribûn dest pê jî bikin.

Ligel van hemû kêş û kêmasiyan jî muzîka Kurdî li ber xwe da û niha jî li ber xwe dide. Ev bi tena serê xwe jî tiştê gelek girîng e.



Albûma we ya ewil “Seyir”, bi temamî ji stranên Tirkî pêk dihat. Em dibînin ku di albûmên we yê din de hejmare stranên Tirkî kêmbûne û we bêtir cih daye stranên Kurdî. Sedema vê yekê çi ye gelo? Mirov dikare bêje ku we bi Tirkî dest bi muzîkê kiriye?

Esasen qeyda min a yekem a profesyonel bi Kurdî ye. Zêmareke bi navê “Fermanê Dêrsimî” ye. Wê demê min di konserên xwe de jî hertim bi Kurdî stran digotin. Wexta min albûmeke bi Tirkî çêkir jî hertim repertuara min a sehneyê Kurdî bû. Wê demê li Tirkîyê gelek zehmet bû ku mirov albûmeke bi Kurdî derxe. Lewma jî kesê nedixwest çêke û firmaya ku min pê re peyman danîbû jî pir îsrar û ez qanî kirim ku ez albûmeke Tirkî derxim. Dîsa jî di projeyên albûman ên hevpar de min stranên Kurdî gotin. Esasen yê ku min nas dikin û guhdar dikin min bi Kurdî nas dikin. Kêma kes stranên min ên Tirkî dizanin. Demeke dirêj min xwest ez albûmeke Kurdî çêkim û axir bi Kalan Muzîkê re me albûma “Keça Kurdan” derxist. Jixwe wan jî di sehneyekê min de stranên min ên Kurdî guhdar kiribûn û wisa teklîf li min kiribûn.



**Axir hîseke xweş e ku mirov fehm bike û were fehmkirin.**

Di nav albûmên ku we heta niha derxistine de, herî pir hûn ji kîjan albûma xwe hez dikin an jî herî pir kîjan bi dilê we ye? Çima? Hûn herî pir kîjan strana xwe guhdar dikin û ji xwe re dibêjin?

Zehmet e ku ez ferqeke wisa bixim nav wan çimkî hemû ji çîrok, kelecana û dewrên cuda nizilîne. Helbet hemû jî aliyên wan ên baş û xerab hene lêbelê albûma min a “Hedûr” ji bo min watedardir e. Ji ber ku ji serî heta binî, hemû hûrgiliyên vê albûmê min bi xwe çêkir. Yanî dikarim bêjim ku bi însiyatîfa min çêbû lê sibe-roj dibe ku ev biguhere. Esasen stran piştî ku diçin ber

guhê guhdaran û ew distrên, li ber dilê min watedardir dibin. Axir hîseke xweş e ku mirov fehm bike û were fehmkirin.

Ji bilî Kurdî û Tirkî, zimanekî din heye ku hûn dixwazin pê stranên bêjin? Ji bo sibe-rojê projeyeke we ya wisa heye ku hûn bi zimanên cuda albûmekê çêkin?

Farisî, Ermenkî û Gurcîkî gelek helbestkî, lîrîk û muzîkal in. Ev ziman ji hêla ruh û hestana jî nêzîkî me ne û ew bi xwe jî civakên nêzî me ne. Lewma ez dixwazim bi van zimanên bêjim. Helbet heke stranek derkeve ber min û tesîr li min bike, dibe. Ger hîs bikim û pirsgerêkeke teknîkî tunebe ez dikarim bêjim lê bi taybetî projeyeke min a wisa tune ye.





## Heke mirov bi perspektîfeke berfirehtir û bêsînortir li hunerê binêre ew ê dewlemendtir bibe.

Wexta ku hûn li kar û muzîka xwe dinêrin, dema ku hûn muqayese dikin; di navbera karên we yê li Tirkîye û Kurdistanê û yê Ewropayê çi ferq hene? Ji aliyê îmkânên ekonomîk û polîtîk de çi cudahî hene?

Herçiqas şert û mercên îdeal nebin jî, Ewropa ji aliyê nasname, zayend, nîjad û reng ve ti ferqê naxe nava hunermendan û wan diparêze. Ger mirov afirîner be, xwedî fikrên baş be, biçûk be jî miheqeq piştgiriyeq an jî elaqeyek çêdibe. Kesên xwedî vîzyon piştgiriyeq dibînin û yê din jî ji xwe re bi şeklekî qadekê vedikin. Mixabin li Tirkîye rewşeke stabîl tune ye. Êvarê qanûnekê derdixin, şeveqê paş ve dikşînin. Mafê te ew li gorî serê xwe diyar dikin û li hesabên wan neyê ji te distînin. Gelek hunermend û stranbêjên Tirkîye an



li sirgûnê an jî di nav neçariyê de dimrin. Sîstemeke manîpulatîf heye û ew diyar dike ka huner çawa dive bê kirin û ji kê re tê gotin “hunermend.” Hunereke li gorî berjewendiyên dibe ma? Heke mirov bi perspektîfeke berfirehtir û bêsînortir li hunerê binêre ew ê dewlemendtir bibe. Li Ewropayê mirov dikare bi hunermend û muzîsyenên dinyayê re kar bike. Divê mirov bi nasname û muzîsyenên cuda re bê cem hev, muzîkê dewlemendtir bike û pêleke global ava bike. Hewce ye em ji bo yê piştî xwe riyeke nû vekin, ev gelek girîng e. Di van şert û mercên Tirkîye yê niha de zehmet bû ku ez van tiştan bikim û bidomînim. Çimkî çarçove û atmosfereke li gorî polîtîkayên rojane heye û ev jî qada mirov teng dike. Halbûkî ev çewt e, dinya ne ev e. Lazim e ev muzîk bidome, ev çand bijî û stran her bîn gotin.

Berî niha we di hevpeyvîneke xwe de gotibû “Hemû hêmanên zimanekî ku hebûna wê nayê qebûl kirin, polîtîk in” Bi vê gotina xwe hûn muzîka xwe jî wek “muzîkeke polîtîk” bi nav dikin? Çimkî hûn jî bi Kurdî muzîkê çêdikin. Ji bo muzîka xwe, hûn vê pênaseya “muzîka polîtîk” tenê li ser ziman dikin gelo? Gotinên stranên ku hûn dinivîsin û dibêjin di vê pênaseyê de cih digrin?

Meseleya esasî nasname û çand e. Ziman jî amûra herî girîng e di vê de. Bo nimûne; li gundekî Mêrdînê heke straneke evîni bê gotin an jî stranek li ser bûkekê were gotin ev çand e û pêwistiyeke xwezayî ye lê ger dema bixwaze vê yekê di qadeke umumî de bike û jê re asteng derkevin û nikaribe vê îcra bike; ev strana evîni an jî kilama li ser bûkekê jî dibe polîtîk.

Lewma jî ne tenê li ser ziman, bi raya min; heke çandek di bin zextê de be, hewla berdewamkirin û gihandina wê çandê ya ji bo nifşekî din, sekneke polîtîk e. Hinek vê seknê bi gotinên xwe, hinek bi newa û melodyên xwe, hin jî bi siyasetê nîşan didin. Yê ku vê dikin, dibin dengê civak,

çand û nasnameyeke ku di bin zextê de ye û ev sekn, hêjayî pêsnê ye. Gelek muzîsyenên me yê jêhatî hene. Van zext û zehmetiyan hemû dizanin û didine ber çav lê dîsa jî çî ji dest û dilê wan tê dikin. Divê di her şert û mercan de piştgirî li vê sekn û biryara wan bê kirin.


Di van demên dawî de; di nav muzîsyenên Kurd de pêlek heye; gelek ji wan stranên klasîk ên Kurdî adapteyî formên modern dikin û dibêjin. Di vir de talûkeyeke wisa heye; ev adaptasyonên ku tên kirin, piştî demekê dişibin hev û tiştekî nû nahewînin di hundirê xwe. Hûn jî stranên adapteyî formên nû dikin, ji bo xwe ji vê talûkê biparêzin, hûn rê û rêbazeke çawa didin ber xwe? Bi ya we, dema straneke klasîk bi formeke nûjen bê gotin, çawa û bi çî şeklî dikare bibe tiştekî “nû”?

Ji bo em stranên klasîk bigihînin roja me, pêdiviya me bi şîroveyeke nûjen heye. Ev karên ku em dikin, dê ji bo nîfşên nû bibin kevneşopî. Ruh û formeke resen ên stranên klasîk heye. Bêyî ku vê texrîb bikin; bi tehmeke nû û teze, bi hîs û hisiyateke cuda em çawa dikarin van stranên jinûve bêjin, ya girîng ev e. Ji bo min ya muhîm ev e ku ez wî rûhî biparêzim. Heke ruhê straneke hebe, jixwe di Cazê de jî, di Rock û Popê de jî ji xwe re nasnameyek çêdike.

### Li gorî min peyva “Texrîbkirin”ê neheqî ye

Hin caran li ser medyaya civakî derbarê we de rexne tên kirin û dibêjin “Hûn stranên texrîb dikin û peyvên Kurdî şaş bi lêv dikin.” Hûn li ser van rexneyan çî difikrin û dixwazin çî bêjin?

Di Kurdî de hema bêje li her herêmekê devok û telafuzên cuda hene. Em li gelek çavkaniyan vedikolin lê pir caran formên ji hev cuda derdikevin pêş me. Heta ji destê me tê, em bala xwe didin ser vê hesasiyetê lê di repertuara nivîskî ya Kurdî de çavkanî gelek kêr in, hema bêje qet tune ne. Ji ber





vê yekê jî carna mixabin xeletî çêdibin. Ez dibêjim em meseleyê wisa bi giştî binirxînin dê baştir bibe. Ez heta 16 saliya xwe li gundekî Dêrsimê yê ku Kurmancî lê tê axaftin jiyam û ez hê jî bi malbata xwe re bi Kurdî dipeyivim. Li gorî min peyva “Texrîb-kirin”ê neheqî ye. Hemû hewl û xîreta min ji bo berdewamkirin û parastina zimên e.

Berê di endustriya muzîkê de du aktorên sereke hebûn; hunermend û produser. Di roja îro de bi derketina platformên streaming têkiliya di navbera herdu aktorên de guheriye. Bi ya we aliyên baş û xerab ên vê guherînê çi ne? Vê guherînê tesîreke çawa li ser karê we kir?

Ji bo serxwebûna hunermendan ev îmkaneke gelek baş e. Mirov çi bixwaze wê çêdike, li ser berhemên mirov gotina dawî ya mirov bi xwe ye. Herwiha mirov dikare qezenca wê jî kontrol bike. Ligel van baxiyên wê, aliyên wê yê xerab jî hene; bo nimûne, di nav aloziya medyaya civakî û çanda populer de zehmet dibe ku mirov tiştên xweş peyde bike û bişopîne. Ji ber ku wenda dibin. Di vir de li gorî algorîtmayekê tu xuya dibî, ev algorîtma jî li gorî tercîha guhdaran çêdibe. Guhdar jî gelek caran li gorî wan tiştên ku çanda populer pêşkeşî wan dike, tercîhên xwe dikin. Ev platform qadeke serbixwe dide hunermendan lê ji ber endîşeyên maddî carna wan mecbûr dike ku berhemên populer çêbikin an jî hunermend mecbûrî piştgiriya firmayên profesyoneltir û mezintir dibin. Ev platform ji bo hunermendên ku portfoyeke wan a guhdaran heye, hinekî din hêsantir e lê ji bo hunermendên din dibe deryayeke mezin û ew tê de wenda dibin. Ji bo kesên ku hertim berhemên resen diafirînin qadek e ku dikarin li wir hunera xwe bidomînin lê ji bo min hêj ne diyar e.

Di van demên dawî de, di muzîka Kurdî de jin bêhtir berbiçav in. Li gorî we jî wisa ye an na? Heke wisa be sedema vê çi ye?

Amûrên ku hunermend û guhdaran digihînin hev zêde bûne, ez bawer im tesîra vê di vê yekê de gelek e. Berê mirov bi mehan heta salan li benda şîrketan bûn lê niha heke qabiliyeteke mirov û berhemeke mirov a resen hebe, mirov hêsantir dikare bigihîne guhdaran. Helbet ev rîskê jî bi xwe re tîne. Li ser van platforman hin caran gelek tiştên bêwate jî elaqe dibînin lê kesên jêhatî û bi berdewamî berheman diafirînin wenda dibin. Tam jî di vir de piştgiri û yekîtiya saziyên Kurdan û gel zehf girîng e.

Di kultura Kurdî de cihekî mezin ê muzîkê heye. Ji ber ku ev kultur bi tradîsyona devkî gihaye roja-me. Kilam û stran ji bo gelê me yê ku bi salan derd û elem kêşane bûne derman. Ev tradîsyon jî piranî bi riya jinên Kurd gihaye roja îro. Herwiha jinên Kurd her dem hestiyar, jîr û jêhatî bûne. Hertim berxwedêr û wêrek bûne û tu caran bêhevî nebûne. Dîsa jî dema li gorî xelkekî bi 40 milyon nifûsî em bifikirin, di muzîkê de hebûna niha ya jinan kêr e. Li ser zemîneke polîtîk a ku dixwaze cudahiyan ji holê rake, gelek zehmet e ku mirov hewla jiyane bide. Divê em baldartir û hesastir bin. Muzîka me muzîkeke folk e, ne ya populer e. Pop, caz, klasîk... Em her kîjanê bikin jî axir em bingeha xwe ji muzîka folk digrin.



# PODCASTERÊN KURD DIPEYIVIN

Di serdema dijîtal de êdî Podcast gelek berbelav in û Kurd jî van salên dawî, di vî warî de çalak in. POPKURD'ê di vê hejmarê de guhê xwe da Podcastarên Kurd. Ka em binêrin bê ka wan çi cewabî dane pirsên me.

**1- Nifşê berê yê Kurdan ne dûrî radyoyan in ku Podcast jî bi rengekî xwe radyo ye. Eleqa guhdaran çawa ye?**

**2- Ji aliyê teknîkî ve çêkirina podcastan zehmet in? Tu çawa ji heqê van zehmetiyan derdikevî?**

**3- Herî zêde kîjan proseya çêkirina Podcastê bi te xweş e? Peydakirina mijarekê, qeydkirina deng, edîtkirin an weşandin?**

**4- Dikarî bi kurtasî qal bikî bê ka xweşî û nexweşiyên deng çi ne li gorî nivîs an jî dîmenê?**

**5- Li gorî cîhanê Kurdan dereng dest bi podcasteran kir? Rewş an jî hejmara Podcastên Kurdî li gorî asta cîhanê çawa ye?**







## PODCASTKURDÎ

### Mevlüt Oğuz (Edîtor)

Ji Heskîfa Batmanê ye. Lîsansa xwe li Zanîngeha Fîratê di beşa Dîrokê de tamam kiriye. Helbest û nivîsên wî di kovarên wekî Pêngav, Çirûsk, Kovara W, Nûbiharê hatine weşandin. Edîtoriya kovara muzîkê ya Ziryabê dike. Piştî ku di kovar, rojname û malperên cur bi cur de nivîsiye, di sala 2017an de bi awayekî profesyonel dest bi karê rojnamevanîyê kiriye û ji bo saziyên ragihandinê yê navdewletî yê wekî Sputnik û WDR Cosmoyê edîtorî û peyamnêrî kiriye. Li Podcast Kurdiyê bernameyê çandî, hunerî û edebî bi navê Derkenar amade û pêşkêş dike. Ji Tîrmeha 2020an û vir ve li Weqfa Îsmâil Beşikcî wekî berpîrsê ragihandin û medyayê kar dike. Oğuz, endamê Federasyona Rojnamegerên Navneteweyî (IFJ), Komeleya Weşangerên Internetê (IYAD) û PENa Kurd e.

<https://podcastkurdi.com>

1- Em weke Podcast Kurdî û bernameya Derkenarê, ji tewecûh û elaqeya germ a guhdarên dilsoz gelekî razî ne. Yek ji tiştên ku me motive dîke û li xebatên nû germ dîke jî ev guhdarên dilsoz û feedbackên wan in. Bi qasî em dibînin, nîsbetî nûçeyên me yê kurdî yê nivîskî, podcastên me têra xwe baş tene guhdarîkirin. Mala gişan ava be, guhdar me bi tenê nahêlin, li podcastên me guhdar dikin, belav dikin; çî erênî û çî neyînî lê piranî bi erênî, li me vedigerin. Ji çar aliyên cîhanê, li welatên ku rêjeya kurdan lê zêde ye, guhdarên me hene û ev yek cihê kêfxweşî û şanazyê ye.

2- Na, ne zehmet e lê ne gelekî hêsan e jî. Bi saya amûr û derfetên teknolojiyê hema bêje her kes dikare podcastan çêbike lê wekî tê zanîn, aliyekî podcastê deng û teknîk be, aliyê din jî mijar e ango naverok e. Eger mijar spesîfik û balkêş be û eger şîyan bi mirov re hebe da ku pîrsên baş ji mêvanên xwe bike û ya girîng, mirov bika-ribe aliyê teknîkî hel bike wê demê çêdibe ku karekî baş û serkeftî derkeve holê. Eger bi baldarî beşên Derkenarê bêne guhdarîkirin dê were dîtin, ez bi xwe gelekî girîngiyê didim naverokê ango serê xwe bi mijarê re diêşînim û heta ji min tê dixwazim naverokeke baş û bernameyê çê derxim holê, lewma kêma bernameyan çêdîkim. Hevkarên me yê ku pisporê deng û teknîkê ne hene, em bi alîkariya wan ji heqê van zehmetiyan derdikevin. Bi demê re em bi xwe jî hînî gelek tiştan bûn.

3- Berî her tiştî ez guhdarekî baş ê podcastan im û lewra ji hemû proseyan podcastê hez dikim, podcast û çêkirina podcastan kêf û kelecaneke zêde dide min. Bi guhdarîkirin û parvekirina guhdaran kêfxweş dibim. Herî zêde dema guhdarek bi wêne yan jî bi kurtevîdeoyekê kêlîka ku li me guhdar dîke bi me re yan bi şopînerên xwe re parve dîke ez kêfxweş dibim. Bo nimûne, guhdarekî me peyamek şandibû û di peyama xwe diyar dikir ku ew bi malbatî li Podcast Kurdiyê guhdar dikin. Her wisa guhdarekî me yê din, kurtevîdeoyek belav kiribû ku tê de ligel du zarokan li beşa

Girr û Gallî Mindalanî Kurd guhdar dikir... Yanî, bi kurt û kurmançî, ez gelekî şa dibim dema dengê me digihê zêdetir guhdaran, bi taybetî jî guhdarên zarok û ciwan.

4- Ji bo xwendinê yan temaşekirinê konsantrasyoneke zêde dive; dema mirov bixwaze tiştekî bixwîne yan li tişekî temaşe bike, divê tiştê ku dixwaze bixwîne yan jî lê temaşe bike, yan divê bi destê xwe bigire yan jî divê bi dest bigire û bi çavên xwe teqîb bike. Herwiha ji bo temaşekirinê, pêwîstî bi konsantrasyonekê zêde heye û li her cihî ne pêkan e ku xwendin bê kirin; mirov li her cihî nikare li tiştekî temaşe jî bike lê podcast ne wisa ye; podcast nisbetî vîdeoyan rihettir û fonksiyoneltir e. Ji ber ku dema mirov li podcastê guhdar dike hewce nake li tiştekî yanî li rûpelekê/ekranekê binêre û handsfree ye (destvala, dest serbest), mirov kengî bixwaze û li her cihî dikare guhdar bike. Ji bo nimûne, mirov dikare hem erebê bajo û hem li podcastekê guhdar bike, mirov dikare hem guhdarî bike û hem jî li metbexê xwarinekê amade bike yan jî karekî din bike. Nexweşiya deng jî ev e, ji ber ku tekane rêya wergirtina zanyariyan guh û guhdarîkirin e û malûm e guh lebateke gelekî hesas e, lewma jî divê podcast bi dengekî baş, bi xwendineke rewan û kirpandineke durist hatibe tomarkirin. Divê deng û dingên zêde tê de nebin û efekt û muzîk jî ne kêman zêde, gelekî bi zanîn û bi baldarî hatibin bijartin û bikaranîn.

5- Na, bi min kurd di vê mijarê de dereng nemane, belkî populerbûna wê hinekî bi derengî ketibe. Lewra wekî hûn jî dizanin, bi salan e, saziyên ragihandinê yên navnetewî yên weke SBSKurdî, Dengê Amerîka, Dengê Rûsya û WDRCosmoyê hin nûçeyên bideng (audionews, podcast) belav dikirin. Her diçe hejmara podcastên kurdî zêde dibe. Digel platforma Podcast Kurdiyê, îro dema em berê xwe didinê em dibînin ku Hûrbînî heye; Nusxeya Kurdî, Podcasta Ziman, Podcasta Rûşûştî, Nawext û Peycor hene. Keza rojnameya Xwebûnê podcastekê bi Kurdî çêdike. Ev in yên ku

yekser têne bîra min. Tevî hemû astengî û dezavantajê xwe ez rewşa podcastên kurdî baş dibînim û her diçe jî wê baştir bibe. Ez ê gelekî şa bibûma ku hevalên ciwan rabin û bernamêyên cûr bi cûr yên spesîfik amade bikin û li me zêde bikin û heta ji me çêtir vî karî bikin.







## THE KURDISH EDITION PODCAST PODCASTA NUSXEYA KURDÎ

### Tofan Sunbul

Li Şirnexê ji dayik bûye. Niha li Zanîngeha Kadîr Hasê di beşa Zanistên Sîyasî de masterê dike. Endamê Chalak Eventsê û Weqfa Îsmâil Beşikci ye. Ji Sibata 2020an û pê ve podcasterê The Kurdish Edition – Nusxeya Kurdî ye, bi kurmancî podcastan amade dike. Li gorî xwenaskirina wî ew ji karên sîvîl û şexsî, ger û muzîkê pir hez dike.

<https://thekurdishedition.com>



1- Podcast li her derê dinyayê derfeta guhdarîkirinê dide guhdarî, bi şev û roj, di rê de û di balafirê da, dema xwarin çêkirinê an jî meşe, em dikarin vê dirêjtir bikin... Cudahîya ji radyoyê ew e ku zeman û cih ji bo podcastê ferq nake, podcast van têgihan û sînoran nas nake, hewcedarî bi frekansekê nîn e yanî telefona her kesî radyo ye. Eleqeya guhdaran jî ji ber van sedemên min gotî zêde ne, ji ber ku guhdar ji her derî bi hêsanî dikare xwe bigihîne podcastê û li gel guhdarîkirinê di heman demê de dikare kareke din jî bike, ev yek dibe sedema eleqeyê. Helbet balkêşiya mijarê, qalîteya dengî, edîtkirin, hîlbijartina stranan, tona dengê axaftvan(an), hwd. jî sedemên sereke yên eleqeyê ne. Wekî mînak dema ez li îstatîstîkan bajarên ku guhdarên me lê hene dinêrim vê dibinim: Stenbol, Hewlêr, Toronto, Silêmanî, Berlîn, Amed, Stockholm, Enqere, Mêrdîn û London. Ev tê wê wateyê ku podcasta me ji çar aliyên dinyayê xwedî guhdar e.

2- Avakarê The Kurdish Editionê (Nusxeya Kurdî) hevalê min Sardar Saadî bi aliyê teknîk û edîtê ve mijûl dibe, ez baş zanim zehmet e, çimkî xelekên podcastên me piranî nêzikî saetekê ne, guhdarî û edîtkirina saetekê jî wextê mirovî zêde digire. Ez qeydên xwe yên xav ji Sardarî re dişînim û ew edît dike. Ji bo hevalên ku cara yekem navê podcasta me bihîstî dixwazim bi kurtî bêjim ku The Kurdish Edition Podcast du sal berê ji aliyê Sardar ve li Torontoyê bi îngilîzî dest bi weşana kir, Sardar hê beşên îngilîzî yên di derbarê kurdan de amade dike û di 2020an de jî min bi kurmancî di heman podcastê da bi navê Nusxeya Kurdî dest pê kir.

3- Peydakirina mijarekê û xebata li ser wê mijarê bi min xweş tê, hem ez hînî mijarê dibim, wekî mînak çî pirtûk, qeyd, gotar hebin li wan dikolim û notên xwe digirim; hem jî guhdar dielime. Carna jî peydakirina mêvanekê û amadekirina pirsan min kêfxweş dike. Dema hemû pêvejoya podcastê xilas dibe û tê weşandin jî gelek pê kêfxweş dibim. Wekî ku min barê ez-

ingên li ser milê xwe gihandibe ber deriyê xwe.


4- Xweştirîn tišta dengî ya li gorî nivîs û dîmenê çavên mirovî azad in, heman demê da guhê te dikare li dengî be û çavên te li tişteki din be. Wek min gava berê behsê kirî guhdarkirin derfeta multi-taskingê (heman demê da kirina gelek karan) dide guhdarî. Lê dema pêwîstî bi çav hebe divê hemû konsantrasyon li ser wî tiştî be; bifikire dema tu lî filmekê/vîdyoyekê temaşe dikî an jî nivîsekê dixwîni divê bala te zêdetir li ser wê be. Tu nikarî bêjî ka ez heman demê da hem li vîdyoyê temaşe bikim û hem li Twitterê binêrim ka çi qewimiye. Lê deng derfeta “hem ... hem...”ê dide; hem guh bidê hem bimeşe, hem guh bidê hem karekî din bike... Xweşîyeke din hem podcaster hem jî mêvanê/a podcastê ji ber ku tenê deng heye xwe rihettir hîs dike, li gorî min guhdar jî ji ber ku tenê deng e xwe rihettir hîs dike, heke vîdyo hebe mirov li cilên axaftvanî, jest û mîmîkên wî/wê jî dinêre, ev jî mirovî diwestîne û dawî bi min deng ji diltir e.

5- Kurdan bi derengî li derveyî axa xwe dest bi weşanên radyoyê kirin û bi derengî dest bi podcastan jî kirin. Ev herdu bi hevdu re girêdayî ne. Li dinyayê pêşiyê Amerîkayê 2003an de dest bi podcastan kir, paşê bi saya Apple ku 2005an sepana podcastê li iTunesê zêde kir belavtir bû. Ji bilî rojname û ajansên nûçeyan, kurdan piştî 2019an dest bi podcastên xweser kirin, yanî ev bûye du sal. Li gorî asta dinyayê û nifûsa kurdan hejmara podcastan kurdî kêmtir in, lê ez bi hêvî me roj bi roj podcastên kurdî dê zêde bibin û zêde jî dibin. Bi zêdebûnê jî podcast dê spesîfîktir bibe û guhdar dê podcastan hilbijêre. Maalîyeta podcastan pir hindik e û zû belav dibe lewma eleqe dê her roj zêdetir bibe, di pêşerojê de sazî û dezgehên kurdan jî dê dest bi weşandina podcastan bikin.





# Li ser pêyan, çend kelam. birûsk aryan



hûrbînî.

## Li Ser Pêyan Çend Kelam HÛRBÎNÎ

### Brûsk Aryan

Ji sibata 2020an û vir ve ye hewl dide bi rêya podcasta Hûrbîniyê quncikekê ji xwe re çêke. Carna ya di dilê xwe de carnan yên di hişê xwe û rojeva xwe de digihîne guhdaran. Bêtir mijarên li ser kultur û dîjîtalîzasyonê bala wî dikşîne.

<https://spoti.fi/3usxZUy> / <https://www.hurbini.com/>



1. Eleqe li gorî mijaran û demê diguhere û helbet hinekî tesîra adetan jî tê de heye. Gava ku mesele tê ser guhdarkirinê gelek kes dixwazin guh bidin ser muzîkê di şûna podcast an radyoyê de bi qasî ez dibînim loma jî ne eleqeyeke ewqasî zêde ye ya heyî.

2. Zehmetî hene helbet, mesele ne tenê qeydkirina deng e. Wekî nivîsekê podcast jî edîsyonekê dixwazin, divê tu hinekî li dora qeyda xwe herî û werî, wê paqij bikî û biedilînî. Heta ji destê min tê dixwazim tiştin fesih derxim holê.

3. Gava ku di hişê xwe de hazirîya xwe dikim, peyvan û hevokan li hev diedilînim, bêyî ku binivîsim, ew prose bi min pir xweş e.

4. Carna xweşiyên wê hene li hember nivîs û dîmenê, carnan jî nexweşî helbet. Tu dikarî belawelatir, rihettir biaxivî mesela. Kes ji te re tiştê nabêje. Ev yek ji xweşiyên wê ne li hember nivîsê bo min. Li gorî vîdeoyê jî hinekî monoton e, kes te nabîne; carna mirov aciz dibe.

5. Wekî her tiştî, erê, ji ber sebebên me'lûm dereng dest pê kirine. Lê ev jî heye îro ro hinekî trend e ev karê podcastan, mirov dikare bêje hinekî gihan wê trendê. Lê hezar podcastên bi kurdî hebin jî wê hindik û kêmbê dîsa, wekî blog an kovaran bifikirin. Çinku gelek disîplîn û mecra hene. Lê ji ber sebebên me'lûm ên zimanê xwe, em şikurîya xwe bi yên heyî tînin, bila hemû her baştir û xweştir bin.



### Robîn Şahîn

Ji Batmanê ye lê ev zêdetirî 10 salan e ku li Swedê, li Stockholmê dijî. Li Tirkiyê di beşa zimanê tirkî de lisansa xwe qedand. Li Swedê li zanîngeha Uppsalayê jî mastera li ser zimanzaniya Îranî/Kurdî qedandiye. Di halê hazir de weke mamosteyê zimanê zikmakî kar dike.

### Podcasta Ziman

[https://open.spotify.com/episode/5fhBQldwDIQcRtVIAFJ2e3?si=Ow-M\\_5Q3tQ2WIEJJRXPYxCA&dl\\_branch=1&nd=1](https://open.spotify.com/episode/5fhBQldwDIQcRtVIAFJ2e3?si=Ow-M_5Q3tQ2WIEJJRXPYxCA&dl_branch=1&nd=1)



1- Mijara podcasta min xisûsî ye, li ser zimanzaniya kurdî ye. Loma kesên ku bala wan li ser vê mijarê ye lê guhdarî dikin. Gelek guhdarên wê nîn in, lê ev ji bo min projeyeke dilxwaziyê ye û ku tene 5 kes jî lê guhdarî bikin ez ê vê berdewam bikim.

2- Ez berî niha weke rojnamevanê radyoyê xebitîm, loma ji aliyê teknîkî ve tu problemên mezin li ber min derneketine. Wekî din jî gelek programên baş ji bo qeydkirin û edîtkirina podcastan hene û ev karê me hesan dike. Karim bêjim ku ji bo her kêşeyekê çareseriyek heye.

3- Herî zêde proseya pêşamadekirinê bi min xweş e. Ez zanyariyên xwe yên li ser mijarê teze dikim û her tiştê ez li ser diaxivim bi çavkaniyan piştrast dikim. Loma ez jî vê hez dikim. Edîtkirin kare herî nexweş e.

4- Di serdema me ya modern de gelek avantajên deng hene. Tu li kû derê bixwazî tu dikarî telefona xwe derxî û li deng guhdarî bikî. Loma ji vî aliyê ve ji dîmen û nivîsê biavantajtir e. Bi taybetî ji bo kurdîaxêvan ev baş e ji ber ku xwendin û nivîsandina kurdî gelekî bi pêş neketiye. Bi ya min divê em di her mijarê de deng zêdetir bi kar bînin da em bigihine zêdetir mirovan.

5-Rast e. Bi taybetî li welatên rojava podcast gelekî popûler in. Hêvî dikim pêşveçûna di vê mijarê de berdewam bike.





## PODCASTA RÛŞÎTÎ

### Robîn Xewla

Perwerdeya wê li ser derûnnaşiya kognîtîv û kargêrîya organîzasyonan e, 27 salî ye û li Stockholmê dijî. Bi roj li ser pêxistina serdarî û şirketan kar dike, û bi şev mazûbana Podcasta Rûşîştî ye. Mereqa wê li ser pêşvebirina hişmendiya Kurdan, û têkîliya ziman û nasnameyê ye.

<https://open.spotify.com/show/OJoO9gljBw35JWzOARHMZP>

1. Peyva “podcast” nenas e ji bo nifşên berê, her çiqas formata radyo û podcast wek hev bin jî danasînek lazim e. Ji aliyê teknîkî ve podcast cuda ye, komputer an jî smartphonek lazim e ji bo guhdarkirinê. Em zanin têkîliya nifşa berê û teknolojiyê rind nine (şandina peyamek jî kare bêderfet be), lê ger bi alîkarîyek karibin bigîhêjin podcasta, ez bawerim wê kêfa wan gelek jê re were. Bi taybetî ji bo meriv ne hewcî zindî guhdar bike, xwendewariyê naxwaze û ger meriv xelekek bicibîne, meriv kare bi nasên xwe parve bike.

2. Çêkirina podcastan ji qeyd û meqeskirinê pêk tê, pêvajoyek ji aliyê teknîkî ve hesan e ji bo cîhaz û berêkanek hûr dixwaze. Pisporîyek hewce nine. Hew mikrofon û komputer lazim e. Hevalek di 20 deqçe rê min da meriv çawa li ser GarageBand meqes dike û xelekan tîne ber hev, bes bû. Amûrên dijital wekî Anchor.fm jî karê meriv hesan dikin.

3. Kêfa min ji edîtkirinê tê, karê berî wê tevlihev e ji bo min. Bûye çend sal ez li ser mijara hişmendî û ziman hûr dibim, wekî behrek bêsînor e û meriv bi rehetî kare tê de winda bibe. Hetta ez naveroka xelekek bidim ber hev û bi şikleke geş û maqûl bînim ziman ez êşek diserifînim, pêvajoya giran ji bo min ev e. Lê dema meriv dengê meqes dike karê dawî tê cîh. Ez podcastan mîna hunerek dibînim, afirandinek tê de heye. Çawa dema meriv rengandina tabloyek diqedîne û gavek paşde davêje ji bo tevahiyê bibîne, dawîya edîtkirinê jî wisa ye.

4. Dema meriv tiştêk dixwîne an jî temaşe dike, dest û hişên meriv girêdayî ne. Meriv nikare kovarek bixwîne û hevdem li daristanê bimeşe (yan jî firaxa bişo). Xweşiya medyaya bi deng, hew guhê meriv mijûl dikin, lewma meriv kare hevdem biza-vên din jî bike.

5. Demek dereng an jî zû tinne ji bo podcastan, meriv kengî dest pê bike ew çax rast e. Îroj podcastên kurdî kêmin li gora zimanên din, lê roj bi roj zêde dibin û ez gengazîyek mezin tê de dibînim. Tiştê herî girîng ew e ku em sînora daneynin ser naverokan, mijarên rast û çewt tinnen. Hew mijar hene. Li cem ciwanên me fikr û ramanên cuda hene, serê wan vala ninin. Lê astengek civakî jî heye, dema kesek fikrên cuda tîne ziman bêaqil û absûrd xuya dike. Ev bedela afirîneriyê ye, rêyek din tinne. Cesaret hewce ye ji bo ramanên bêhempa werin qeydkirin û bibin perçeyek di arşîva me ya dijîtal.


# MESELE GIRAN E

Kitêba “beyana xwarinan û zewqên wan” şêx mihyedînê hênî bi amadekariya mele birhanê tarînî û bi edîtoriya remezan alan, ji nav weşanên peywendê derket. Mele mihyedîn ev berhem di sedsala 19emîn de nivîsiye. Di warê xwarinê de berhemeke tekane ye. Di nav berhemê de navê 140 xwarinên kurdan derbas dibe. Lê di nav kitêbê de hin beyt hene ku di pêvajoya weşandina berhemê de bûn cîhanê nîqaşê. Di van beytan de şêx mihyedîn peyvên heqaretwarî avêtinê kurden me yên zaza.

Ji wan peyvan hinek ev in:

“Vizik çizika dimbiliyan heye  
Qeda bê li van dimbiliyan se ye  
Li navan binêre evê lezzetê  
Çi kim ku te’am e dikim hurmetê  
Heçî dimbilî ne heram in heram  
Minafiq we rûreş we kelb in tamam  
Me seh kir ji şeytanî ye cumle tev  
Ji ber ku xiyala ewan roj û şev  
Nîfaq û xiyamet we cille û kîn  
Bizan wan heram in di rûyê zemîn”

Li ser vê; hin nivîskar û akademîsyenan got ev berhem bi van peyvan divê bi tu awayî neyê weşandin û bang li nivîskar û edîtorên berhemê kirin ku teqez vê kitêbê çap nekin. Heta ji ber van nîqaşan çapkiriya berhemê bi qasî demekê hat talokirin. Me jî ev mesele ji aliyên nîqaşê pirsî ka çi mesele ye, divê çap bibe an nebe.







## ROŞAN LEZGÎN

Se'iyê Karazî ji malbata şêx Ehmedê Karazê ye, navê wî Mihyedîn e. Xwendina wî ya medreseyê bilind lê ew gelek nizim bûye. Li gorî gotinên xelkê, li derdora Hêneyê bênamûsî dike lewre ji kurdên dimbilî lêdaneka baş dixwe. Vê dike kîn û di helbestekê de heqaret li tevayî kurdên dimbilî dike. Hingê merivekî bêexlaq bûye, Ehmedê Xasî li ser wî helbestek nivîsandiye ku ez ê li jêr pêşkêş bikim.

Se'î di helbesta ku li ser xwarinan nivîsiye de bi giştî zimanekî pîs bikar tîne ku dilê meriv li hev dikeve. Bo nimûne:

“Qeda bê li dolmeê pîvaza gelek  
Wekî hêlikê kûçikan e felek” (r. 46)

Wê kuvtê ji kuncî qeda lê keve  
Wekî rêxa teze ku kurm têkeve (r. 47)

Ji ku derketî ey şî'îra [şe'rîyeya] şepal  
Wekî kurmê pišta keran ey heval (r. 57)”

Lêbelê melayek nuxsaya vê helbesta wî li medreseya Axtepeyê dibîne û nîşanê du mamostayên ku li Unîversîteya Artuklu dixebitin dide. Ew jî herwekî ku tişteki pir hêja keşif bûye, weşandin. Berî ku biweşînin,

Prof. Qedrî Yıldırımî em xeberdar kirin. Me ji wan re got “Misrayên ku heqaret têde heye, jê derxin” lê ji ber quretîya xwe guh nedan me.

Xuya ye ku kurmancên me dixwazin vê helbesta fitne derxin pêş û tefrîqayeka din têxin nav grûbên me yên civakî! Ez çi bêjim? Em guh bidin Ehmedê Xasî:

*Dirêj ke Xasîya, nezmek cedîde  
Di piştî çend selam û çend tehiyyat  
Li ser Karaziyê ku nav Se'îd e  
Dixwîne ew ji ber Încîl û Tewrat*

*Li textê xwe ku rûnê Qeyser e ew  
Li hespê xwe siwar be 'Enter e ew  
Di seyra roj û şev Îskender e ew  
Bi wechê xwe li Cahiz bûye deh qat*

*Lehû wechun 'ebûsûn qemterîra  
Lehû şeklun yumasîlhu 'l-be'îra  
Lehû xeddun yecanîbhu 's-se'îra  
Hewe'l kabûsu beyne nasî bîzzat*

*Gelî qazî û miftiyê qeza me  
Bizanin ev Se'îdê sextename  
Bi nîspet me ji ewwel ve xulam e  
Eger şahid dixwazin, Hewr û Şeqlat*

*Li nik îmamê Dêrûnê û Hûrê  
Nikare yek nefes pif ke bilûre  
Dixwe sondê bi Tewrat û Zebûrê:  
“Ez im îro Herîriyê Meqamat”*

*Belê da’wa diket ku: “Şair im ez  
Di ilm û hem edeb da mahir im ez!  
Bi hukmê îsmê E’zem qadir im ez  
Bi firek ji Cûmê herme Cûmat”*

*Qe ne b’xêr be, Seîd îsal li mal e  
Bûye me’mûrê exnaman îsale  
Çiqas kûsî û kêrgoyên li pal e  
Dibê “Qaçax e, bigrin, bermedin, hat”*

*Bes e Xasî, bira xame xeber de  
Se’îd bû bûk û şaşik kirye perde  
Ji rî hona kezî, kom kir li e’rde  
Li ser eqda nîkah e, maye ew mat*

*Eger bêjin: “Nîkaha wî li kê bû?”  
Dibejin: “Aşiqê Fexrî begê bû”  
Fexrî begê go: “Sûcê şaşikê bû  
Mi go qey Nazlîxan e j’ perde da hat”*

*Bes e Xasî, Seîd mîrê melan e  
Welê aşiq bûye l’ keçikê Filane  
Nikare zeft ke bonciyên qulane  
Welew sancûl bikî wan tu ji polat*

Ehmedê Xasî, Mewlûdê Nebî, Transkrîbekerdox:  
Mihani Licokic, Weşanên Firat, İstanbul 1994 r. 44-48

### **Mele Birhanê Tarînî**

Ewilî ez meseleyekê zelal bikim; ew Sa’îdê ku Mele Ehmedê Xasî di helbesteke xwe de peyv avêtinê, ne Sa’îyê Hênî(Şêx Mihyedîn lawê Şêx Ehmedê Karazî) ye ku xwedî berhema xwarinê ye. Yanî ez teqez dikarim bêjim ku ev tiştê ku hin alî îdia dikin ne rast e û kî bixwaze ez dikarim jê re îspat jî bikim.

Em werin ser meseleya weşandina berhemê.. Ev berhema bi navê “Beyana Xwarinan û Zewqên Wan” ku min ew kişf kir, latîniye kir û ji bo çapê hazir kir, di edebiyata Kurdî ya klasîk de rêzeke nû bû ku di warê midbex û kîlera Kurdan de hatibû





nivîsîn. Heta niha ji bilî vê di warê xwarinê de tenê wek 10 helbestên Ebû Îshaqê Şirazî bi zaravaya Lorî hatibûn nivîsandin. Wekî amadekar, edîtor û weşanxaneya berhemê, me nexwest em sansurê li wan peyvên li dijî Zazayan û xwarinên wan bikin. Her çiqas ji bo sansurkirinê ji terefê gelek kes û aliyan ve em hatibin telqînkirin jî wek ehlaqî û wijdanî, me nexwest em bibin wek wan xelkên ku nivîs û berhemana sansur dikin û me halê berhemê yê resen û orijînal çap kir. Helbet em jî ji wan peyvên wî yên li dijî Zazayan aciz dibin lêbelê wek ilmî ne rast e ku em sansureke wisa li vê berhemê bikin. Di vê meselê de, nexasim di pêvajoya çapkirinê de hin alî û şexsiyetan gelek zext li ser me kiribin jî em gihastin wê encamê ku em vê berhemê bi halê wê yê destxetî û ilmî çap bikin.



**EMERÎKÊ SERDAR:  
“WERGERA KITÊBA LAZAREV  
MIN KIR LÊ TÊMÛRÊ XELÎL LI  
SER NAVÊ XWE ÇAP KIR”**

Yek ji kesên ku ev demek e di nav Kurdan de qala wî tê kirin Kurdologê Rûs M.S. Lazarev e. Bi taybetî piştî meseleya “Mafê Şeva Ewil” ên Taner Akçam, Lazarev di rojêva Kurdan de bû. Hêj ku ev mesele dihatin axaftin, dîsa meseleyeke ku bi Lazarev re têkildar jinûve hat rojevê. Li gorî îdiaya Nivîskar, wergêr û rojnamegerên Kurd ê rehmetî Emerîkê Serdar, wî kitêba Lazarev a “Pirsa Kurdan” ji Rûsî wergerandiye Kurdî lê Têmûrê Xelîl li ser wê wergerê rûniştiye. Serdar dibêje tevî ku tevahiya kitêbê min wergerand jî, Têmûrê Xelîl ew li ser navê xwe çap û belav kiriye.

Çavkanî: Twitter ; @dferid1



# ME JI 10 KESAN PIRSÎ

**Gelo herî pir kîjan şair an jî nivîskara jin  
a Kurd tesîr li ser we kiriye? Çima?**





**Mizgîn Aksoy**

Bêguman Fatma Savci...

Em di jiyana xwe de dikarin ji her tiştî xwe rizgar bikin ji bilî bîranînên ku di bîra zakoktiya me de veşartî û nixûmandî ne. Fatma bi nexşên xwe yên peyvan destê xwe dide serê wê zaroka ku xwe di wex-

tê xwe de veşartiyê û porê wê şeh dike, carna geş dike wê, carna jî haş. Bi taybetî jî helbesta “Çemê Xewnê” ji bo min xwedî ciyekî taybet e û delalî ye. Ji ber ku min kêliyêkê dibe bîranînên min û riya rastiyên min li min vedike.

Di qadekê ku tim mêr li serê ne, hebûna nivîskar û helbestvanên jin ji bo me serbilindiyeke bêhempa ye. Em spasdarê wan hemû jinan in ku dengê me bi bêjeyên xwe yên nazik û nazênin dinexşînin ser rûyê dinyayê.

**Mahir Yüksel**

Nivîskara Jin a Kurd a ku herî diecibînîm Sevda Kaplan e. Ji ber ku di pirtûka xwe

ya bi navê “Jin Aştiya Jiyanê ye” de gelek serkeftî û zelal rol û keda jinên Kurd a di çanda Kurdî de rave dike. Di rengînî, dewlemendî, qedîmiya çanda Kurdan de, dest û helwestên jinên Kurdan hêmanên sereke ne. Ji ber vê perspektîfê min gelek ji wê pirtûkê hez kiribû. Lewma jî bersiva min Sevda Kaplan e.

**Elif Ersal**

Di nav helbestvanên jin de ya herî bandor li min kiriye Fatma Savci ye. Bi zimanê

helbestên xwe, cihê ku lê mezin bûye û çanda civaka xwe dide der. Ji hemû helbestên wê hez dikim, bi taybetî helbestên dîwana “Danê Baranê”. Bi min helbestên xwe bi zimanekê birîndar dinivîse û di wê baweriyê de me ku Fatma Savci dîrokê, di berhemên xwe de bi awayekî helbestî pir baş diafirîne.

**Şükran Yağuz**

Bo min bersiva vê pirsê Jîla Huseynî ye. Helbet bo helbestê dibêjim. Ji helbesta wê gelek hez dikim, bi taybetî dema min xwend, dîtî û anîna ziman a evîne di helbesta wê de, gelek bandor li min kir. Jîla rûmetê dide evîne. Her ku qala êş û janên evîne dike, pênasekirina asta evîne jî bilind dibe. Wekî mînak, evîna Jîla darek e û koka xwe di xaka evîne de kûr dike. Ev eşq ewqas mezin e ku êdî dibe sedem tu maşûq biçûk bibînî. Çimkî eşqa wê kitêbek e û maşûq hîn di rûpela pêşî

de diweste. Dibe ku ji mezinahiya evîne ditirse. Ev mezindîtina hezkirinê, wekî dîtineke felsefî û israrkirina di evîne de bo min jî mottoya jiyane ye û bo helbestvanekê, vê yekê gelek bi bandor dibînim. Jiyana wê bi xwe jî wekî helbestê ye bo min. Him jiyana wê dişibe ya Furûx him jî helbesta wê. Ya din, Jîla tevî mirina xwe ya di rê de jî bi tevayî rêwîyê helbestê ye. Wekî minak Şêrko Bêkes tê Têhranê û Jîla jî tevî keça xwe ya biçûk dikeve rê da ku wî bibîne. Lê di rê de qeza pêk tê û jiyana xwe ji dest dide. Dema ez vê hîn bûm, min ev yek wekî mirineke sembolîk a di riya helbestê de dît û gelek xemgîn bûm. Jixwe Şêrko Bêkes jî dibêje “şî'r maşûq bû û Jîla jî aşîqê wê bû”. Bi evîne bi bîr tînim...



**Ferhadê Mihemed**

Bêguman ev pirs hem pir dijwar, hem jî pir hêsan e. Hêsan e; ji ber ku li ser vê pirsê navekî yekta ji bo min heye. Dijwar e; gelek navên din ên kedkar û jêhatî yên edebiyata kurdî hene ku meriv dikare bi saetan li serê sohbet û danûstendinê bike. Herçend edebiyata kurdî bi zilaman bête nasîn, ewçend li pey perdeyê jinên pênuştûj bi awayekî pêşçav xuya dibin. Lê belê em divê ji bîr nekin ku ev tespît û bicihkirin mixabin ji bo van salên dawîn e. Ev salên dawîn ji bo edebiyata kurdî, bû pêvajoya nûvejîn û ronensansê. Heke em werin ser navên nivîskar ên jin ên kurd, -yên ku tên bîra min- serqiseyê Jana Seyda, Yildiz Çakar, Çidem Baran, Fatma Savcı, Gûlîzera Dildar, Nûroj Mûnzûr, Eysana Beravî û -nîhayet- Lorîn S. Dogan. Ev navên ku min hejmartin, bêyî yekê bi tevahî ji Bakurê Kurdistanê ne, digel vê yekê hema çi bigire hemû bi şihîrê rabûne û

gelekî berhemên manzûm yên hêja anîne pê, paşê hinek ji wan, ber bi nesîrê yanî pexşan û romanê ve qulipîne, li gor min ev nîşanê pêşveçûnê ye bi awayekî.

Li vir, li ser vê pirsê we, ez divê çelî nivîskareke taybet a edebiyata kurmancî bikim; Lorîn S Dogan. Nivîskariya vê nivîskara rêşînas, bi rastî jî pir spesîfîk û orijîn e. Edebiyata wê li ber dil û mezgê min gelekî giran û buha ye. Wextê ku min çîrokên wê xwendin, ez di navê de wenda bûm, çîrokên wê yên ewçend xurt -hem ziman û mijar hem jî hûnaksazî û hem jî sadebûyîna wan, nexasim ziman û mijar (wêrekiya vegotina hin tiştên li bin kulînan mayî) - bi destên min girtin û ez gerandim, gerandim û gerandim. Çima ewçend bala min kişand û tesîr li ser min çêkir? Bêşik bersiva vê pirsê zelal e, ji ber ku Lorîn S Dogan çîroknûs e û ez jî hem xwendeyekî çîrokê me û hem jî qada edebî ya ku ez herî zêde li serê radiwestim. Divê em wêrekiya wê qet ji bîr nekin. Heçî kitabên wê ne, hemû pir hêja ne, lê belê Kirasê Teng ji hemû berhemên wê hêjatir e.



**Canan Yalçın**

Ji bo min bersiva vê pirsê Fatma Savcı yê. Her careke ku ez helbestên Fatma Savcı dixwînim, ji bo min dibe tecrbeyeke cuda. Heçku ez keşfeke ji nû ve dikim, ez sinorên fikrekê xera dikim û ez gelek hestên veşartî dikolim. Di nav mijarên helbestên Fatma Savcı da ji bilî tunekirin, kuştin, bêzimanhiştin, neheqî û bêdengkirinê, sêrhildaneke li dijî serweriya mêran jî heye. Bo nimûne, Fatma Savcı di helbesta xwe ya bi navê “Av û Agir” de weha dibêje: “Dest nedin dilê min / qelûnên xwe ji

hestiyên min çêbikin.”

Fatma Savcı ji bilî helbestên xwe, bi çiroka jiyana xwe û pêvajoya nivîsandina helbestên xwe jî tesîreke kûr li min dike. Di hevpeyvînekê de behsa sekna xwe ya li hemberî polîtîkayên înkarkirinê dike û dibêje ez alfabeta kurdî ne bi pênuş û lînûsê hîn bûme, min li ser berfê dinivîsi û ji ber dikir. Di hevpeyvîneke din de jî behsa nivîsandina helbestan dike û dibêje gava ez di girtîgehê de bûm, min li ser pelên cixarê helbestên xwe dinivîsandin û vedişartin ku gardiyanên û berpîrsiyan girtîgehê wan neşewitînin. Ji ber van û gelek tiştên din ez dikarim bibêjim ku Fatma Savcı ji bo min nîşaneyeke, ‘azadiya welêt, azadiya jin û azadiya gotinê’ ye.





### Vural Erişmiş

Li gorî min Mesture Erdelan e. (Mah Şeref Xan, Masture-i Kurdistanî (1805-1848)-(Dîroknas û Helbestvan) Yekem dîroknasa Kurd e û Li Rojhilata Navîn yek ji dîroknasên jin e.

Bêgûman gellek kesan bi rê û rêbazên cuda li ser dîroka Kurdî nivîsî. Lê belê yek ji van heye ku ji nivîskarên din cudatir e. Masture Mahşeref Erdelanî yekem Jina

Kurd e ku dîroka Kurdî nivîsandiye. Ne ku tenê li ser dîroka Kurdî di warê dîroka Islamê de jî weke jina yekem a dîroknas e.

Ji ber vê çendê dema ku min Masture Xanim û xebatên wê yên ku di nava 43 salan de kiriye xwendî, bandoreke mezin li ser min kir, bi taybetî jî ji bo ku dîroka Kurdî bê zanîn her di nava hewldanan de bûye. Ne ku tenê dîroknas, di heman demê de helbestvaneke mezin bû. Heta di gotineke xwe de dibêje “di sedsala 18an de ev yek ket para min ku ez bibêjim ez bûme serfirazî û serbilindiya vê sedsalê” ji ber van sedeman Masture Mahşeref Erdelanî ji bo min xwedî ciheke taybet e.



### İlknur Bilir

Min heta 28 saliya xwe Kurdî nedizanî lê ev salek e ku ez ferî kurdî bûm. Min ewilî dest bi xwendina helbestên bi kurdî kir, ji ber ku wekî şairekî gotiye “helbest cihê birîna me ye ku em hê nizanin derdixîne holê.” Loma rêya min a ku ber bi zimanê kurdî ve diçe bi zinarên helbestên kurdî re hat avakirin. Li ser vê rêyê, berhemên Gulîzer, Fatma Savcı û romana Yıldız Çakar a bi navê “Ev Rê Naçe Bihûştê” niha di mejîyê min de mane. Lê ji ber ku ez li Berlinê dijîm ji bo min gihiştina kitebên kurdî ne gelek hesan e loma ez arşîva xwe ya dijital bi kar tînim. Dema min şairên jin

ên kurd xwendin, bi taybetî min dît ku bîra jinan bi zor û zehmetiyên ku gelê kurd di dîroka xwe de dîtine re hatiye avakirin. Lê bele, helbesta şairên jin ên kurd, bi taybetî jî nifşên nû, bi gotinên xwe, bi awayên xwe û bi helwestên xwe, li ser bingehê bê zordestiya zayendan hatiye avakirin. Bi rastî ez li benda nifşên nû yên şairên kurdî me. Di van deman de, dem car caran dibeje “rewrewka dîrokê em xapandin” lê baweriya min ji nifşên nû yên şairên kurd ên jin gelek heye! Ez dixwazim rojekê bibihîzim ku wan jinan, awayên kevn ên wejeya kurdî hejandine!

Bi şewanê Fatma Savcı diqetînim

“Baskên xwe fireh veke qubanê,  
hîna ji xewna me ya şîn re heftê û heft firîn hene...”



### Rûmet Med

Di wêjeya Kurdî de gelek helbestvan û nivîskarên jin hene ku bi berhemên xwe tesîr li min kirine. Lê herî zêde jî şîrên helbestvana kurd Semra Çelebî bandor li min kiriye. Ji ber ku peyv û hevokên wê wekî herikîna xwezaya jîyanê ne ku dibin newayên qedîm û mîna rengê biharê şîrên û diherikin.

Ez ji sînemayê û helbestê pir hez dikim, helbest û bi giştî wêje yek ji hêmanên girîngtir ên sînemayê ne. Rêbaza Sînemaya Helbestkî ji bo hunera heftemîn gelek

girîng û diyarker e ku ji hevokên helbestan, newayên muzîkan û reng û dengên dîmenên derasayî pêk tê. Zimanekî helbestkî û rastînî dikare peyv û newayên mezin biafirîne, û fikr, hest û ramanên xwe yê jidil wekî herikîna robarekî an jî neynikeke zelal bîne zimên, û li dîrokê hertim bimîne. Ji ber vê jî ez nêzî derbirineke rastînî û helbestkî me.

Helbestvan Semra Çelebî di pirtûka xwe ya “Birîn”ê de zimanekî wisa, zimanekî helbestkî, rastînî û resen afirandiye. Dema ku mirov helbestên wê dixwîne di nava xweza û jîyanê de derdikeve rêwîtiyeke bêdemsal û bêhempa. Risteyên hevokên helbestvanê dişibe reng û dengên nipînû vedibin û asoyan kûr dikin..



### Bernas Qerejdaxî

Wextê behsan nivîskarên jin ên kurd dibe, bê şik du nav tên bîra min; yek jê Rewşen Bedirxan ya din jî Kurdistan Mukrîyanî ye. Bi zanebûn, xebat û şarezabûna xwe li ser min tesîr kirine. Wextê min ew nas kirin û haya min ji xebatên wan çêbû, li ser navê netewa xwe ez pirr şa bûm û her min got çendî jinên zana ji nav vî milletê derketine û ji bo ziman û kelepura wî xebitîne. Herdûkan jî arkeolojiya bîr u entelajansiya kurdan tim û tim temsîl kirine. Her çendî ji edebiyatê zêdetir xebatên Dî filolojî/linguîstîk û cûrên din de bêtir nivîsî bin jî, Bi kesayet û xebatên xwe mîrateyek makî ji me re hiştine. Li gor wext û mercê, rol û navên mêran li hember kolonyalîzm û ferhenga kolonyal bêtir li pêi xuya dike lê helbet li gorî dema xwe, jina kurd du peyv jî nivîsî bin, ev pir pîroz e. Vê yekê jî paye û siûda xwe ji binemala ku van kesayetên pêgirê wê ne digre, ev jî bê guman mala Bedirxaniyan û Mukrîyaniyan e.

Em werin ser edîbeyan. Romanek an

çîrokên ku ji pênuşa jina kurd derçûbe min bi têra dile xwe û baş nexwendîye. Ji vê şûnde hêviyên min hene ku ezê bixwînim. Şî'ra modern a jina kurd hema hema min hemî xwendine (nexasim seta Şahmeran). Ya li ser min tesîr kir Fatma Savcî bû. Şî'ra wê kemilîtir bû. Lew şî'ra tenê bi bêjeyan hatibe şayesandin mekanîk e. Şî'ra Fatma di şî'ra me ya modern de xwedî qonaxek resen e. Hêma/teswîr û zimanê wê ligel formê peywendiya şî'r, hêma û bêjeyan de hostetiyek heye. Formên tradîsyonel yekcar neşkandîye lê lîrîzmek zelal tê de heye. Her çendî li zindan û li mişextiyê şî'ra wê kemilî be jî, dîsa ajît-pro ango hamasî û şopên îdeolojîk tê de tûne û ev yek jî poetîka wê baştir dike. Şa'ireke din ku min van demên dawîn xwendî û ecibandî jî Buşra Kesnezanî ye. Ez bi xwe ji epîkê hez nakim lê vegotin û forma şî'ra Buşra wekî ew jî dibêje “ev nûjenkariya ne populer a edebiyatê ye û nivîsê zindî dike.” Di klasîk û modernê de pirek bi zimanê dêrîn danîye, ev yek jî gotina Adonîs tîne bîra min: “her nêrîna şa'ir vediguhere perçeyek ji raboriyê. Tiştêk nûh tune, tenê heman obje an tişt, kinc û nêrînen nû lê dike. Tiştên em îro dibinin wek do xuya dibin.”



# CLUBHOUSE: Şevbihêrkên Modern

Di van rojên koronayê de hevalên me yên herî nêzîk bûn telefonên me, ji xwe berê jî kêm zêde wergî bû lê niha em ji heval jî zêdetir û nêzîktir in. Firset ev firset e; firma û şerîkeyên mezin zêdetir li ser bername û xizmetên online dixebitin û ev demek e jî bernameyeke nû derketiye. Li cem Ewropîyan dîyardeya “Clup” hebû jixwe hertim. Kesên xwedî klas, xwedî taybetmendî an dewlemend komek ava dikirin, mirov tenê bi vexwendinê karibû tevî komê bibe û endamên komê him bi hev re wext derbas dikirin hem jî ji bo kar û xebatên xwe hevkar û tekilî datanîn.

Di heman mantiqê de bernameyekî nû hat çêkirin, navê xwe jî “Cluphouse” e. Em Kurdên bakûrî wek “qilûphawûs” dixwînin. Xêr e nizamî lê me dil heye di peyvên beyanî de, di destpêkê tîpa “ke” hebe îlam em wê bikin “qaf”. Nêse... Apple dîsa Appletîya xwe kir û bername tenê ji bo Appleê derket. Yanî herkes nikare tevî bibe! Xwedan Adroîd dîsa serê xwe tewandin ber xwe, wek êtim û sêwîyan di orteyê de man. Lê tenê Apple jî ne bes. Wisa her kesekî ku ayfonê xwe hebe jî nikare bikeve Qilûpê. Divê ji alîyê endamêkî Qilûpê ve hatibin dawetkirin. Bê dawetîye nameşî û çênabe. Her kesek jî dikare despêkî 2 yan 3 kesan dawet bike. Vêca kesên ku bikaribin bikevin Qilûpê 2 car serbilind dibûn di nav xelkê de.

Ketina Qilûbê bû mesele. Ev hin kesên kû mafê dawetîye henin, despê firotina dawetîyeyan kirin-lê cem me Kurda ev tişt nebû. Qet pirsax xwedî Androîdan nekin. Gogerçînekî birîndar, yataxa derd û kula bûn! Wan jî li ser Facebook û Twitterê hawara dikirin emê çito vê bernameyê daxin!

Hemû van merhele û pêvajoyên xilas bûn şûnda, min jî pozê xwe bilind kir û ez ketim Cluphouse. Û hema min xwe avêt jûrên bi Kurdî. Min dît ku her kes hewl dide bi Kurdîyê “akademîk û gewre” biaxive. Demekî wisa çû heya ku Soranên me yê delal û çavreş jî bername keşif bikin. Edî ne standart ma, ne Badînî ma, ne Zazakî.. Wekî ku Çarşiya Şewitî ya Dîyarbekirê û Bazarî Gewre yî Hewlêr li nav hevdu ketibin.

Wekî ûtopiyayek; Kurd bi hemû zarava, bi hemû dev û devokên xwe di odeyekê de kom dibin, dicivin û her kes yekûdû têdigêhe, sibhanallah! Rastî jî wisa bû, ji bilî hin îstisnayan. Ji van îstisnayan yek jî hevalêkî Efrînî bû ku min ew dawet kiribû, navê xwe Zorba bû. Feqîrê Efrînî dizane, meseleya “girîng” “bandor” û “pêvajoyên” jî çareser kiriye lê bes hew qas. Soranî çetin e. Û em bi hev ra rûniştine, xofek ketîye hindirê wî, dibêje îca ku ji min tiştêkî bi Soranî pirs

bikin û ez jî fêhm nekim, pirs şermezarî ye. Û her ku digotin “Zorbeyî ew şitekan( bi soranî tê meneya ‘piranîyê van tiştan’) hilo dibû, ji min pirs dikir digot “çi ji min pirs kirin?”. Axîr fêr bû ev zorbe ne Zorba ye. Wekî di wê minakê de jî xûya ye, bername ji bo nêzîkbûna Kurdan zor baş e(Haho’ Soraniya min çito ye ama!), Efrînîyek fêr bû zorbe çîye. Heger mirov her roj 2 peyv û wişe fêr bibe di 2-3 mehan de dikare hemû zaravayên Kurdî kêm zêde qise bike.

Ji bo min jî tecrûbeyên gelek ecêb qewimîn. Di odeyekê de civînek hebû ji bo “Roja zimanê Kurdî”, her kes bi zarava û devokên xwe çend tiştan dibêje. Min jî vekir û bi Kirmanckî/Zazakî qise kir. 2-3 kesan mikrofônên xwe vekirin gotin “Em Hewramî ne û zimanê te em têdigêhin, wekî Hewramî ye.” Kêf xweş bûm welle, gelek gelek dilşa bûm.

Îca te dî edetên me yê berê hebûn. Mixabin ez bi xwe bajarî me, bi çavê xwe nedît min lê berê li gundan şevbihêrk çêdibûn. Di şevbihêrkan de carna dengbêjan kilam digotin carna ji çîrokbêj behsa çîrokan dikirin. Bi ya min bi rengekî xwe ev ode, wekî oda şevbihêrkan in. Kurdên me li ser Cluphouseyê şevbihêrkên online li dar dixin. Şevkê, şevbihêrkeke gelek ciwan kom bibû. Ez jî di odê de me helbet. Ji her hêla welêt Kurd kom bûne. Şingal, Efrîn, Agirî, Semsûr, Urmîye.. Kurdekî Nisêbînî jî mikrofôn girtiye û çîrokan dibêje. Her kes hiskut û bêdeng bûye lê guhdarî dike. Tenê ji me kemaçeyê Toriyan kêm bû yanî.

Medyaya civakî li ser gelek miletan gûhartineke mezin pêk anî. Facebook bû bingeha bihara ereban bo nimûne. Milletên ereb ketin tekilîyê bi erebên welatên din re. Bo me Kurdan jî nîmeteke mezin e. Bawer bikin, bernameyê wisa berê 10 sala derketiba niha me behsa zarava û hevdu têgehîştinê nedikir. Lê bila!

Îro derfeteke ciwan ketîye destê me bi xêra bernameyên medyaya sosyal. Înşallah em karibin baş jê îstifade bikin.

**ÎBRAHÎM SEYDO AYDOĞAN  
RÊBAZEKE PERFECT DÎTIYE  
BO STANDARDÎZEKIRINA ZIMÊN.  
KEREM BIKIN**







# POP PIRS

# Nûveen Barwari

Di 1995an de li DY'ê ji dayik bûye û salên ciwaniya xwe li Duhokê derbas kiriye. Barwarî li Zanîngeha Dewletê ya Tennesseeyê, di 2019an de “Bachelor of Science in Studio Art” qedand. Niha li heman zanîngeha, li ser “Hunerên Ciwan” masterê dikim. Hunera wê li ser hilweşandina materyalên nav performansan; berhevkerin û jinûve berhevkerina berhemên ji civakê mezintir wek wêne, xalîçe, qumaş û kincên Kurdî ye.



Peyva ku tu herî zêde jê hez dikî?

Aştî.

Tu dikarî kêliya xwe ya herî bextewar ji me re bêjî?

Dema ku ez biçûk bûm û digel dayika xwe diçûme bazara Peroka ya li Duhokê.

Tehemula te ji çi re tune ye?

Ez tehemulî faşîstan nakim.

Te li vê dinyayê herî pir dixwest kê nas bikî?

Hevrin Xelef.

Xeyala te ya herî mezin çi ye?

Xeyala min a mezin ew e ku rojekê em Kurd di aştî û azadiyê da bijîn.

Bi xêra xwe hevokeke ji strana ku herî zêde jê hez dikî bibêje.

“Gulê nadim malê dine,  
Ez ser gulê tîm kuştinê,  
Gulê nadim malê dine,  
Ez ser gulê tîm kuştinê,  
Gulê kesk û sor û zer e,  
Nîşana alê li ser e,  
Gulê kesk û sor û zer e,  
Nîşana alê li ser e” –

Mihemmed Şêxo

Çi kenê te tîne?

Karê Dave Chappelle.

Dengê ku tu herî zêde jê hez dikî?

Dengê çeqçeqa kevçîka nav piyaleya çayê da.

Heke cardin bihatayî dinyayê, te yê çi tiştî cardin bikira?

Ez ê careke din bibûma hunermend.

Tiştê ku îlhamê dide te çi ye?

Ez di nabeyna kultura Kurdî û ya Emerîkî ya vê serdemê de pêwendiyekê dibinim û ev dibe feyz ji bo berhemîna karê min.

Dîmeneke çawa te aciz dika?

Dema dibînim kesek an komek tûşî zordariyê dibin.

Te dixwest tu li ku derê bijî?

Duhok, Kurdistan.

Qisûra te ya herî mezin çi ye?

Ez keseke girîyok im gelek.


Tu dixwazî çawa bimrî?

Li serê çiyayekî, li Kurdistanê.

Dixwazî çi li ser gora te bê nivîsandin?

“De hu bit” ...





# DI EDEBIYATA KURDÎ DE **DENGÊN JINAN**

Di Edebiyata Kurdî de jin di “odeyên xwe” de, bi gotinên xwe deng didin.

Lê belê, wekî her qadên civakê,

di qada Edebiyata Kurdî de jî dengê jinan bi têra xwe nayê bihîstin.

Me jî xwest bi vê beşê, dengên jinên wêjevan bigihînin xwînerên Kurdî.

Me ji 5 jinên wêjevan derbarê edebiyata jinan

û weşangeriya Kurdî de çend pirs kirin.





### Herdem Merwanî

Di sala 1979an de li navçeya Farqînê ya Amedê hatiye dinyayê. Di sala 1992yan de ji ber sedemên polîtîk hat girtin û di girtîgehê de dest bi nivîskariyê kir.

### Berhemên wê:

Çira, helbest, Weşanên J&J, 2018, Amed

Reqsa Perperîkan, helbest, Weşanên Payîz, 2021, Amed




### Di weşangeriya Kurdî de, jin ne li pêş in. Bi ya we sedema vê yekê çi ye?

Di civaka me de wêje, nivîskarî û helbestkarî hertim wek karê mêran hatiye dîtin û vê nêrînê bandor li roja me jî kiriye û hê jî derdikeve pêşberê me. Ev nêzikatî bûye sebeb di weşangeriya kurdî de jin li derveyê weşangeriyê bimîne. Ev pisgirêkek şênber e di weşangeriya kurdî de. Di van salên dawî de herçiqas jinên nivîskar zêde bûbin jî lê dîsa weşangerî ji bandora mêran derneketiye û hê jî wek karê mêran tê dîtin. Pisgirêk tenê bi avakirina “yekîtiya jinên nivîskar” dikare were çareserkirin.

### Wekî jineke wêjevan, tiştê ku feyzê dide edebiyata we çi ye?

Wek zimanê kurdî, wêjeya kurdî jî dewlemend e û ev dewlemendî feyzê dide min. Ez zarokek bûm ku li ber Radyoya Erîwanê bi stran û jiyana dengbêjan mezin bûm. Bûyerên li ser me kurdan diqewimin bandorê li jiyana me dike ev bûyer yek bi yek feyzê dide ku ez karê wêjekariyê bikim. Mînak: Di heman demê de hestên wek jan û hêvî, ken û girîn, jiyana û mirin em bi hev re dijîn. Ev hest giran tî, mirovan bê hilm dihêle. Ji bo ji vê giraniyê rizgar bibim xwe, dilê xwe dispêrim wêjeya kurdî. Ji bo min bi kurdî helbest nivîsandin berxwedan e.





### Jana Seyda:

Sala 1976an li bajarê Amûdê hatiye dinyayê lê li bajarê Kobaniyê mezin bûye. Li zanîngeha Helebê, fakulteya endezyariyê xwendiyê lê xwendina xwe neqedandiye.

### Berhem û wergerên wê:

Şeva Dawî, Helbest, Avesta 2000

Destê Sibê (deriyên nîv-vekirî yên evînê)- Helbest- Bajar 2004

Ber Êvarî, Helbest, Avesta 2007

Palyaço- Pexşan, Avesta 2011

Bîreweriya Laş, Wergera Romana Ehlam Mîsteğanmi, Avesta 2006

Feqeyên Tariyê, Wergera Romana Selîm Berekat, Avesta 2013


Jineke Mirî li Cîhangîrê, Roman, Avesta 2021

### Tu bi xwe ji Rojava yî. Li wir rewşa jinên wêjevan çi ye gelo?


Li Rojava berî şer, zimanê Kurdî û wêjeya Kurdî qedexe bû, kitêbên Kurdî an ji derveyê welêt dihatin belavkirin an jî bi qaçaxî dihatin çapkirin û ne tenê nivîsandin û çapkirin, herwiha xwendina wan jî sûcekî siyasî bû. Jina kurd a wêjevan di nav qedexeyêke du-alî de bû, ji aliyekî ve dewlet û ji aliyê din ve serdestiya civaka mêrane ya ku kar û barê wêjeya jinê paşguh dikir. Ji ber vê, jina wêjevan bi zoriyêke mezin û di bin şert û mercên aloz de dinivîsand. Ji ber ku ez ji wir dûr im niha, haya min ji rewşa heyî zêde tûne ye.

### Li Rojava eleqaya xwîneran ji bo edebiyata Kurdî çawa ye? Weşangeriya Kurdî li wir di çi astê de ye?

Niha jî li Rojava tevî ku sazî û weşanxaneyên Kurdî çêbûne jî mirov nikare bi giştî encameke berbiçav jê wergire, civaka Kurd a Rojava civakeke ji ber koçberiyê û ji ber rewşa şer a ku hê berdewam e belawela ye û di rewşeke wiha de civandina agahiyan li ser weşangerî û rola wê di civakê de zor û zehmet e û eger bibe jî divê ji jêderên li Rojava were stendin.








### MÎNA ACER

Li gundekî Dêrika Çiyayê Mazî çêbûye û niha li Amedê dijî. Beşa karûbarên Civakî û Civaknasî qedandiye. Niha jî li zanîngeha Stenbolê perwerdehiya zarokan dixwîne. Dîwana wê ya yekem a helbestan ji Weşanxaneyê Lîsê bi navê “Kulîlkên Mala Miriyan”(2020) derket.



### Bi ya we, edebiyata Kurdî ya jinan, edebiyateke feminîst e an na?

Ez nikarim bibêjim bi gelemperî edebiyata jinên kurd feminîst e, her yek bi awayê xwe dinivîse. Min pirtûkên gelek nivîskarên jin xwendine, di her pirtûkê de mijareke cihê heye. Her berhem xwedî cureyeke din e. Lê dibe ku car caran hin tiştên bêhna femînîzmê jê tê jî hebin. Ne tiştekî pirr xerîb e. Ev edebiyat e, huner e mirov nikare sînoran li ber deyne.

### Hûn wêjeya xwe wekî wêjeyeke feminîst bi nav dikin gelo?

Helbesta min îtiraza li hember zulma li ser jinê ye. Ew neheqîya di her qada jiyana de, li gund, li bajêr, di nava malê de diqewime. Min, ya xwe aniye ser zimên. Gelek êş hene ku dengê wan li newalan belav bibe jî, li latan diqewime û dîsa vedigere xwe li sînga jinê digire. Ev in tiştên di helbestên min de. Ger ev feminîstbûn be, belê ez ji vê yekê xweş im. Helbestên min civakî ne û li hember zordariyê ne. Zordarî jî bi pirranî li hember jinê pêk tê.

### Ji ber nasnameya jintiyê, hûn ji derî van kêşeyan çi kêşeyên cudatir dikşînin?

- Ji aliyê civaka patriarkal ve, ji xwe ez jî weke her jinê li zordariyê rast hatime û hîna jî tîm. Ez dibêjim; ev yek dikare bersiva hemû kêşeyan bide.





## NÛROJ MUNZUR

Di sala 1988 de li Batmanê ji dayîk bûye. Bi eslê xwe ji Şemrexê ye. Di navbera salên 2003 û 2016an de di bin banê NÇM'ê de li Batman, Şermex û Bismilê wek muzîkjen xebitiye. Niha li zanîngeha Munzurê zimanê zazakî dixwîne û li ser vê beşê niha li Zanîngeha Hamburgê di beşa Îranîstik de erasmusê dike.

### Berhemên wê:

Bêrîkirinên Îlegal, Helbest, Weşanên Na  
Êdî Navê Te Aso Ye, Helbest, weşanên  
Ronahî


Beytikên Nifiran, Helbest, weşanên  
Avesta

**Gava em bala xwe didinê, em dibînin ku jinên wêjevan, li gorî qadên din ên edebiyatê bêhtir di warê helbestê de xuya ne. Bi ya we sedema vê çi ye?**

Elbet gelek sedemên vê yêr dîr û dirêj hene lê ez dikarim kurtî ve bibêjim; Çawa ku em giş dizanin di hemû civakan de helbest pêla yekem bûye û piştê lêhûrbûna beşên din çêbûye û çîrok, roman û her wiha dawiyê bi pêş ketine. Civaka jinan jî dikarim bibêjim, di merheleyeke wiha de derbas bû. Dibêjim derbas bû, ji ber ku niha gelek roman, çîrok, werger û her wiha ji pênuşên mor derdixin û ev gelekî li ber çav e. Bawer im rewşa nivîskarên jin a di vî çend salên dawiyê de dikare şewaza pirsên me jî biguherîne!

**Wekî jinekê, di proseya nivîsandina helbestekê de herî zêde kîjan qonax bi we zor tê?**

Wek helbestvanekê di avakirina helbestê de tiştê ku herî zêde zehmetê dide min, hevoka yekem a helbestê ye. Mîna ku tu biryar bidî bi cihê de bicî, lê nizanîbî bikevî kîjan rêyê.







### PINAR YILDIZ

Serra 1988î Dîyarbekir de maya xo ra bîya. Serra 2013î ra nat Kirmanckî nûsena. Aye lijneya kovara Ewroyî de ca girewta. Di kîtabê aye weşanxaneyê Avesta ra vecîyayî: “Vena”(Şiîr), “Hikayeyê Hewn û Hişyarî”(Hikaye). Kîtabê aye yo bîn zî weşanxaneyê Vateyî ra vejîya:”Mehelî û Kirmanckîya Înan” (Tez)



**Seba ke kurdkî kêmtay yeno wendiş û nuştîş, edebîyatê kurdkî zî kêmtay yeno wendiş. Hela ke edebîyatê bi dîyalektê kirmanckî/zazakî goreyê ê bînan kêmtir yeno wendiş: gelo na babeta kêmtanîyayîş yan zî xonêresnayîşê wendoxan ser o ti çi fikirîyena, na babete edebîyatê to ser o senîn tesîr kena?**

E, rast o kîtabê kurdkî tay yenê wendiş, xaseten kirmanckî/zazakî hîna kêmtay yeno wendiş. Helbet no çî hetêk ra motîvasyonê merdimî kêmtay keno. La esasê xo de ez zaf zî nê meseleyî ser o nêfikirîyena. Peyên de mîrasêk ma rê mend û heta ewro xo resna ma, seba ke ez zî tayê çîyan nê mîrasî ser o bizêdna, nusena. Kirmanckî nuştîş seba mi sey yew cinî, sey yew kesa ke leteyêkê na cuye û edebîyatî ya, ez vaja ke ‘Ez zî tîya ya!’ Sey dapîre û dayîkanê ma ke no zîwan sevekna, ez vaja, ‘Ez zî tîya ya!’ Bi zîwanê xo, bi fikranê xo, bi hîssîyatê xo, bi ewnîyayîş û vînayîşê xo ez zî tîya ya. Çîyê ke ma nusenê nêbêrê wendiş zî ez bizana ke siba-bêr kesêk zî bo vejîyo û biperso, gelo azo ke ma ra ver ciwîya ma rê çi verda û biwazo ê çîyan biwano, seba ê yew kesî bo zî, ez motîve bena ke binusa. Seba mi tesîrê kêmtanîyayîşî o yo ke na rewşe xo rey de kêmbîyayîşê rexneyî zî ana. Çîyê ke to nuştê wexto ke nêameyê wendiş, nêameyê rexnekerdiş û şîrovekerdiş, talukeyê avernêşîyayîşî vejîyeno meydan. Yanî o ke reyna yeno goşanê to de zimeno heyf ke vengê to yo. Ti veng û ewnîyayîşê merdîmanê bînan nêeşnawena û nêvîna. Rast o nuştîş, bîlhesa wexto ke to bi yew zîwanê ke zaf tay yeno wendiş, nuşt manaya nuştîşî “tenatî” ya. No zîwano tekûtena embazê tenatîya min o. Nê wextê ke ez tede ciwîyena de, beno ke ez na tenatîya xo ra hes kena.

**Sey edebîyatê dinya edebîyatê kurd-kî de zî “edebîyatê camêrdan” yan zî “vengê camêrdan” her tim ê cinîyan ra hîna zêde çiman ver de yo û vejîno. Ti sey edebîyatkarêka cinî, seba edebîyatê kurdkî na rewşe senîn nirxnena? Goreyê to sebebê ney çi yo, kam o; weşanxaneyî, edebîyatkarê camêrdî, wendoxî yan cemmat/komel... Mesûl kam û çi yo?**

Rast o, na babete seba edebîyatê dinya zî problemêko pîl o. Çend serrî verê mi waşt ke ez seba xo lîsteyêka sey nuştovanê cinîyan amade bika û berhemanê înan biwana. O wext ez dekewta mîyanê berhemanê nuştovanê cinîyan la heyf ke hûmara înan rasta zî zaf tay bî. Nêno vîrê mi ke lîsteya mi hûmara çendine de mende. Hema ra zî kitêbxaneyê mi de beno ke tena di-hîrê refî berhemê nuştovanê cinîyan estê. La wexto ke ma agêrê edebîyatê xo ma vînenê ke hûmara înan kêmtir a. Bîlhesa warê hîkaye û romanî de ewro belkî des nuştovê ma yê cinî çin ê. Sebebê nê çî, ê çîyê ke şima cor ra rêz kerdî, ez vana qay sebebo tewr pîl komel o. Zaf newe yo ke cinîyê ma dekewtê mîyanê komelê sosyal û ekonomîkî. Ewro sewiyeya ke ma resayê çî, komel musayo ke cinî bikewê mîyanê cuya sosyal; unîversîte ra mezûn bibê û dest bi kar bikê la hema ra zî komel nêmusayo ke cinîyan sey hêzêkê fikrî bivîno û paştî bido înan ke cinîyî bikewê mîyanê dinyaya hunerî û biafirnê. Ewro çend camêrdî, birayî, bawkî estê ke seba ke cinîya înan, waya înan, kêneya înan çîyêk biafîna hetkarîya aye bikê, seba aye zehmetîyan bi-ancê? Ganî ma nê çîyan xo ra bipersê. Eke wina nêbîyayêne o tradîsyonê dîyasporayo ke zaf nuştovê camêrdî vetê çira nêşka çend nuştovanê cinîyan zî vejo. Halbukî wexto ke merdim teber ra ewnîyeno, uca de rewşe û îmkanê cinîyan û mêrdeyan sey pê asenê. La ê îmkanan ra tena nuştovê camêrdî vejîyayê.

Eke merdim hetê weşanxaneyan, edebîyatkarên camêrdan û wendoxan ra biewnîyo mesele ra hêz û waştîşêko pozîtîf esto hemver cinîyan de. Çîyo ke ez vîne-

na her kes wazeno ke hûmara nuştovanê cinîyan vêş/zêde biba. Zaf reyî ê zî vanê ke edebîyatê ma zaf “bi zimbêl” o. Seke ê zî nê “zimbêlanê” edebîyatî ra eciz bîyê. La çîyo ke mi eciz keno ganî “ma” yan zî “ê” tena sey hûmare nêewnîyê mesele ra. Peyên de ma tena hûmarêk nîyê. Heyf ke dinya de zî rewşe wina ya. Sey nimûne ewro kamcîn nuştova cinî, ê ke xelatê pîlî zî girewtê tede, qasê nuştovanê camêrdan yenê şinasayene û wendene. Mesela hema her kes fîlmê Hanekeyîyo ke bi nameyê Mamosteya Pîyanoyî zano la tay kesan o romanê Elfriede Jelineka wayîra xelata Nobelî ya, wendo. Virginia Woolfa ke goreyê ê bînan hîna zaf name û veng dayo, unîversîteyan de hetê akademîsyenanê camêrdan ra tena bi femînîzmêkê “tûjî” û “trawmayanê” xo bi şekilêkê negatîfî yena mojnayîş. La eslê xo de Woolf terz û teknîkêko newe bexşê edebîyatê dinya kerd, aye bi ê terzê xo yê serkewteyî sînore camêrdbiyayîş û cinîbiyayîşî wedartê. Helbet merdim nêşkeno nîyetê kesî biwano la çîyo ke ez vînena rast o ma “zimbêlanê” edebîyatê xo ra zaf eciz bîyê. La gelo rasta zî ma zerrî ra wazenê ke ê zimbêlan bitaşnê/bikê war û rasta zî ma meraq kenê ke gelo nuştovê cinî ma rê se vanê, çî mojnênê ma? Şima pê zanê nameyê kitabêkê Bedrîye Topaçe “Bero Sûr” o. Esasê xo de Bedrîye Topaçe, cuya cinîyan û problemê cinîyanê ke peyê ê berê sûrî de nîmite mendîbî motê ma û hema ra zî mojnena ma. Gelo rasta zî ma wazenê ke ravîyarê peyê ê berê sûrî û bivînê ke ka uca de çî esto?





# EM Û BOTOKS



Dr. Rodî Zanyar

Botoks hêmaneke çanda populer e. Hema beje êdî haya herkesî jê heye êdî. Zêdetirî 20 sal in ev botoksa hanê ketiye nav jîyana me û her ku diçe jî belav dibe. Ez ê di vê nivîsê de behsa populerîteya botokse bikim û çend zanyarîyên bingehîn yên derbarê wê de bidim we xwînerên ezîz.

Botoks bi eslê xwe jahrek e(erê erê), ji bakteriya bi navê Clostridium Botulinum tê hilberîn. Mekanîzmaya botokse; sethkirina/ferckirina masulkeyan e. Botoks masulkeyûn ku liva wan dibe sedama qermiçokan, ferc dike û qermiçokan jî holê radike.

Botoks ewilî ji bo çareserkirina şaşitiya çavan an jî çavşaşîye hatiye bikaranîn. Dixtorên ku şaşitiya çavan bi botokse çareser dikirin, dîtine ku qermiçokên derdora çavan kêmtir dibin an jî ji holê radibin. Pişt re bijîşkan botoks ji bo jiholêrakirina qermiçokan jî emilandine. Di 15-20 salan de botoks êdî bûye sembola estetîkê, ciwan-kariyê.

Di serî de tenê dewlemend û hûnermendan, ji bo xweşik xuya bin, derziyên botoksê li xwe dixistin. Ne îşê feqîran bû yanî. Mirovên ji rêzê, botoks wekî tişteki ecêb didîtin, hinekan qeşmerîyên xwe jî pê dikirin.

Niha edî pirranî civaka me dizane ka botoks kême zêde çi ye. Berê mirov ji bo derziya botoksê diçûn bajarên mezin lê edî Lî her deverên welêt bijîşkên botoksê çêdikin hene. Tenê li Amedê zêdetirî 20 an dixtorên botoksê çêdikin hene.

Yên temenê wan di navbera 30-50 salî de ne, zêdetir ji bo botoksê telebkar dibin. Telebkar piranî jin in lê bala meran jî her ku diçe zêdetir dibe.



Ha em vê jî bêjin, botoks dermanekî wekî ardik an jî toza di şûşe de ye. Divê li cihekî pir cemidî weke sarinc de bê mi-hafizekirin. Heke li gorî şerd û mercên taybet neyê veguhastin û parastin, dê tesîra wê nebe an jî kêmbê.

Ji bo botoks weke derzî bê lêxistin, divê ewil bi serûmên taybet were avdan. Pişt re li gorî devera laşî, masulkeyên ku livên wan dibin sedema qermiçokan tên derzîkirin.

Botoks ne tenê ji bo jêbirina qermiçokan tê bikaranîn. Ji bo rakirina birûyan, rastkirina quncikên levan, kêmkirina dohn û xwêdana zêde û dirustkirina şiklê poz û rûyê mirovan jî tê emilandin.

Înjeksyonên botoksê ne zêde biêş in, derziyên serî pirr zirav tên bikaranîn. Enjektirina botoksê nezikî 5 deqîqeyan diajo. Piştî înjeksyonê mirov dikare here ser karê xwe. Bandora botoksê demildest dest pê nake, heya 10-15 rojan qermiçok holê radibin.

Tesîra botoksê ne mayînde ye, piştî 3-8 mehan botoks xwe bi xwe bêbandor dibe. Piştî bandora botoksê diqede qermiçok wekî berê dibin, xirabtir nabin. Heke botoks 2-3 salan li ser hev bê çêkirin tesîra botoksê piçek mayînde dibe.

Divê botoks bi destê bijîşkên pîspor bê çêkirin. Heke na; mirov dê xwaro-maro bibe û ev rewş heya 5-6 mehan dê wisa bimîne.

Ne baş e ku mirov di salên biçûk de dest bi botoksê bike. Zûbizû botoks çêkirin jî ne baş e. Her mirovek; şiklê, îmajê xwe ya taybet heye û divê ew şikil û îmaj neyê jêbirin. Di navbera seansên botoksê de divê mirov bihêle ku masulkeyên mirov piçek werin ser xwe, liv û quweta xwe bi temamî wenda nekin.

Botoks di qada estetîkê de amûrekî pirr girîng û berbelav e. Heke li gorî rê û rêbazên zanistî were bikaranîn, dê mirov ciwan bike lê heke ne li gorî vê be dê mirov bike qeşmer.







Mistefa Çelebî

Melûm e, gava ku em behsa kurdên li welatekî din bikin koçberî wê bibe çarçov-eya sereke. Kurdên li Fransayê jî bi piraniya wan ji ber sedemên curbicûr ên mîna polîtîk û aborî hatine van deveran. Jiyana wan a koçberiyê jî di nav dînamîkên wê civakê de ji xwe re riyekê dibîne û tê de diherike û diçe. Ew bajar û civakên ku lê ne çiqas derfetan bide wan, ew jî di nav sînorên van « derfetan » da mobîlîze dibin ango diçin û tên.

Em ê ji we re behsa jiyana Kurdên li Fransayê bikin lê zêdetir jî yên li Parîsê. Wexta ku meriv li nava bajarekî mîna Parîsê digere, hemû tebeqeyên civakî û çînî dibîne. Her hêmaneke civakî, her rastîyeke civakî li nav bajêr cihê xwe dibîne û ev cih-girtin jî tistekî qedîm e, weka taxên zengîn û feqîran, bazarên eşyayên entîqe, bazarên

diziyê, cihê hesîs-firotanê, dikanên erzan, kuçeyên tolazan, mastê erzan, şeyê seriyân, kirasên qebrê û hwd. Li bajarê Parîsê jî, her çinekê xwe li taxekê girtiye û carna sînor bi awayekî şênber xwe diyar dîkin. Kurdên li vî bajarî jî malên wan exlebê li çeperên bajêr in, wekî ku Frensî jê re dibêjin “banliyo” yanî taxên li qeraxa bajêr.

Ev banliyoyên Fransayê, bi awayekî dîrokî ji banliyoyên Îngiliz û Emerîkayê cudatir in, xasma jî ji aliyê endustrîalizebûnê ve. Berê aristokratên Parîsê, malbatên qewî û giran ku ji toz û dûmana bajêr aciz bibûna û ji xwe re li derdora Parîsa kevn, di nava daristanan da koşkên mezin û biheybet çêdikirin da ku carna herin bêhna xwe lê vedin û ji xwe re têkevin nava kêf û henek û zewq û laqirdiyan. Ji destpêka sedsala bistan vir ve ji van koşkan ra dibêjin “pavillon”, ev peyv wateya wê guheriyê û wekî “pavyon” derbasî zimanê Tirkî jî û helbet Kurdî jî bûye. Pist re burjûvayîyan jî ew texlît kirine û ev der bûne mekanê malbatên bûrjûva. Lê di nîveka sedsala 20an de, gava ku Fransa ji koloniyên xwe yên Efrîqaya



Bakûr vekîşiya û ligel koçberiya polîtîk a li welatên derdorê (koça ji Îspanya û Îtalyayê ji ber zilma dîkdatorên wan) û zêdebûna nifûsê, pêdivî bi bajar û cihên nû çêbûn. Bê guman ev banliyo û erdê derdora van navendên dîrokî-biçûk, ji bo vê pêdiviyê derb bûn. Dewleta Fransayê li van deran malên bi girseyî çêkirin ku di her yekê da bi qasî nifûsa taxekê dikaribû bi cih bibûya. Bilind, dirêj, bi dehan tebeqe. Ji serê salên nodî vir ve, piştî ku yê ji çîna navîn ji van deran aciz bûn û vejeriyan nava bajêr, ev der ji koçberan re ma ku îro jî xelk « ditirse » here van deran û nav û dengê wan bi xerabî belav bûye. Kurdên koçber jî ji ber derfetên aboriyê û sedemên civakî xwe dispêrine van banliyoyan, lê ne hemû.

Bi ya min sedemên herî pêş, sedemên çînî ne lewra bi her awayî Parîs bajarekî gelekî buha ye, xusûsî jî nava bajêr. Ev der cihê moda, sêwirînerî, tûrîzm, mûzexane, huner, bazara hunerê û kultura Parîzîyan e. Gelek aliyên vê kulturê hene ku wisa herkesî bi hêsanî hilnade nava xwe, loma çînî ye belkî jî elîtîst e.

Ji ber ku ev nivîs li ser Kurdên li Parîsê ye em ê jî bi mobîlîte û jiyana Kurdan va sînordar bimînin. An na dîrok û çîrokên Parîsê di pirtûkxaneyan da hilnayên!

Kurdên me jî çendek li van banliyoyan dijîn (hinekên wan bi gundîtî hatine), yê din jî li taxên din belav bûne li gorî derfetan. (Heta ku carna meriv jê dipirse dibêje tu ji ku derê yî, bi qesta tu ji kîjan bajarê Kurdistanê yî, dibê ez ji filan gundî me). Li banliyoyan an jî nava her bajarekî Fransayê qehwexaneyên koçberan hene ku diçin lê çayê vedixwin, okêy dilîzin, nargelê dikîşînin û zemanê xwe derbas dikin. Dema ku ji kar derdikevin heta ku du-sê dest okê nelîzin bêhna wan nayê ber wan. Ev der jî ji bo van kesên xebatkar mekanên sosyalbûnê ne, li van deran hevdu dibînin, dikevine civatê, haya wan ji hev çêdibe û bo pistgiriya hevdu, hev agahdar dikin weke şîn û şahiyên.

Banliyoya Sarcelles'ê wê bibe mînakeke balkêş bo me. Piştî salên destpêka avakirina van banliyoyan kesên tê de dijîn (zêdetir jî jin û zarok) ji ber tunebûna mekanên sosyalbûnê û sporê dikevin valahiyeke derûnî/psîkolojîk û gelek kes xwe dikujin. Pişt re ev nexwesî weke Sarcelit derbasî lîteraturê dibe. Li vê banliyoyê hinek kurd, hinek keldaniyên Şîrnexê, cihû û gelek milletên Efrîqî dijîn. Piraniya niştecihên vir bi cil û bergên xwe yê netewî digerin. Zimanê Fransî ya li banliyoyan tê axaftin jî bileksê







Fransiya Parîsiyan a « standart » weke zimanekî gelekî protest xwe nîsan dide û argoyeke xurt peyda bûye. Mînakeke din jî bi vê meselê ve girêdayî, ew jî bandora muzîka rapê ya banliyoyan e. Zimanê ciwanên van banliyoyan û muzîka wan îro bandoreke gelekî mezin li muzîka Fransî ya nûjen dike. Li her derê ev stîl tê guhdarkirin.

Lê di nava Parîsê de semtek heye ku herkes jê re dibêje « mehle », ew jî Stasbourg-Saint-Denis ye. Ev tax, weke taxa Kurd û Tirkan tê naskirin. Şaredarîya vê semtê jî vê kuçeyê ra dibêje « petite Istanbul » yanî Stenbola biçûk, ji ber ku esnafên vê derê piranîya wan ji Tirkîyê û ji Bakûr hatine. Tabelayên dikan û restorantan, zimanê esnafan, dînê taxê... Tev bi van herdu zimanan in. Hinek ji van însanan, kîjan dewrê hatibin vir, hê jî wisa dijîn ! Hinekên wan piştî derbeya leşkerî ya sala 80yî hatine, hîn wer dizanin ku hêj ew gorbigorê Kenan Evren li iqtîdarê ye, yek dudu hene bi fesên sor ên Osmanî digerin û ji hev re divêjin “azîzîm-mazîzîm” filan. Yên herî balkêş bi min ev in. Lewra wekî hûn jî dizanin Dewleta Osmanîyan ji zû ve ye ku xera bûye.

Ev fotograf, ya serbikekî avê û dew e, me ji restoraneke Kurdan girtiye ku ku navê restorane jî Sandwich Kurd e. Min çima ev wêne xist nava nivîsê, ez qala wê bikim; bê guman meqseda min ne ku ez Kurdan bînim bi serbikekî nîşan bikim an jî ev ne temsîliyeteke e. Lê dîmena tevliheviya îmaj û îmgayan xweş tîne zimên. Serbikê sifir an jî paxir(baqir) bi vê şeweya xwe têr oriental

e û îmajeke rojhilatî ye. Îja ew barûya Eyfelê ya li ser jî îmaja Parîsê û ya Fransayê bi xwe ye. Bi vî halî ez weke objeyeke “hunera koçberiyê” bi nav dikim. Di navberê da maye, tevlihev e, sentezeke nû ye.

Tabî ne tenê kurd li vir dijîn, cîranên wan Efrîqî, Hindû, çînî û heftê û du miletên din in. Li vê semtê kuçe jî li gorî etnîsîteyê par bûne û gava ku tu bixwazî taybetiyên kulturî yên xelkekî binasî tu dikarî bi dilekî rihet herî van deran, ji xwarinê bigire heya lixwekirinê, her tiştî dişêy peyda bikî. Hema bêje keştiya pêxember Nûh ne li Cûdî, li vê semtê daniye. Welhasil ev « mehle » gelekî kozmopolît e. Du garên trêne yên mezin ên Parîsê jî dîsa li vê semtê ne.

Kurdên ku ji zû ve hatine van deran, di karên cuda de dixebitin, her wekî di karên enstîtusyonel ên dewletê û karên şexsî. Lê me behsa derfetan kiribû, ev derfet jî bi sînoran ve girêdayî ne. Kesên ku bi zimanê vê derê baş nikaribe emel bike, di karên cuda de dixebitin ku zanîna zimên li wan ferz nake. Ev kar jî zêdetir wek karê firotina donerê, karê însaetê û yên mîna van in.



Lê li vê taxê saziyên Kurdan ên çandî û hunerî-zanistî jî hene. Muzexaneyê Ahmet Kaya ya ku eşyayên wî yên şexsî lê ne jî dîsa li vê taxê ye. Ji xeynî vê, saziyên komeleyên çepgir ên ji Tirkîyê, loqimte, donerfiroş, qesab û dikan jî hene ku dims û toraqê ji Tirkîyê û ji Bakûr tînin û li vir difroşin. Te dî hin kes bêriya tahmên welêt dikan.

Li Parîsê saziyên Kurdan û derdora akademîk-entelektuel jî zû ve ye hene. Beşa Zimanê Kurdî ya zanîngeha Inalco'yê ji Kamûran Elî Bedirxan û Roger Lescot vir ve heye, Enstîtuya Kurdî ya Parîsê jî ji destpêka salên 80yî vir ve bi pêşengiya yên mîna Yilmaz Guney, Kendal Nezan û gelek mirovên kedkar hatiye avakirin û hê jî karên xwe didomîne. Ev herdu navend bûne bîra kurdî ya nivîskî, li van deran li ser kurdan çî hatibe nivîsandin tê berhevkerin. Ji van herdu saziyan Enstîtu, semîner, kolokyûm, festîvalên filman, konser, organîzasyonên Newrozê û çalakiyên kulturî yên derbarê kurdan da li dar dixê, Beşa Zimanê Kurdî ya Inalco'yê jî perwerdehiya xwendekarên lîsans û masterê bi sê zaravayên kurdî dide. Ji xeynî van, Enstîtuya Kurdî ya Parîsê gelek berhemên biqîmet diweşîne. Ji van du heb periyodîk in ; Etudes Kurdes (Xebatên

akademîk ên li ser Kurd û Kurdistanê) û Kurmancî (lêkolînên li ser kurdî-kurmancî û hûn dikarin online peyda bikin).

Xwendekar, lêkolîner û mamosteyên Kurd li hemû zanîngehan belav bûne. Xwendekarên Kurd di nava xwe da « Koma xwendinê ya Parîsê » ava kirine (înstagrama wan jî heye ger hûn bixwazin bi-sopînin @xwendinparis) ku her mehê bi temayekê li hev dicivin, analîza pirtûkan dikan û li ser diaxivin. Ji bilî vê xwendekarên Kurd ên li Parîsê, li ser navê komeleya xwendekarên Inalco'yê ya beşa Kurdî kovareke bi navê « Kurd'Inalco » derdixin. Di vê kovarê de jî ji her disîplînê nivîs hene, herkes li ser pisporiya xwe dinivîse lewma jî kovareke gelekî dewlemend û rengîn e.

Me di serî de behsa koçberiyê kiribû, gava ku kesek dimire jî carna li ser daxwaz û derfetan cinazê wî kesî dibine welêt, carna jî li goristaneke Parîsê (an jî li ku bijî) tê binaxkirin. Gelek Kurd hene ku li vê derê hatine binaxkirin. Li goristana Père Lachaise'ê jî kesayetên wek Yilmaz Guney, Abdurehman Qasimlo, Ahmet Kaya, Said Şerefkendi û gelekên din binaxkirî ne. Herwiha ev goristan gelek navdarên cîhanê jî dihewîne.






**Kunyeya Wêne**
**Navê Wêne:** Li Bazara Çûkan a Rihayê Çavên Pepûk

**Wênekeş:** Ötekilerin Fotoğrafçısı

(Mehmet Rehavi Kılıç) ruhavi3@gmail.com

**Dem:** 2018

**Cih:** Bazara Çûkan a Rihayê

**Wergera Ji Tirkî:** Ferhadê Mihemed

Awir, qilqale û guman û tirs. Çavên pepûk. Li siberojê hêvîdarî. Kew û mêkew. Jiyana penaberî û kirêfî. Dûrî. Cûma ji welatê xirbe û kavil, ji Sûriyê ye. Hê xortekî nûgihîştî, li derê welatê xwe, di nav xerîban de, bi xwedîkirina kewan tê nasîn, min ew li cihê bazara kevokan a Rihayê nasî. Hingê -mîna her car- dilê min sofî. Hemû tiştên xweş yên ku wî li pey xwe hiştine di navenda çavên wî de, xwe di dilê min de da hestkirin. Ez hizirîm. Hem jî ez kûr û dûr hizirîm.

Evçend sîleh, top û balefirên giranan hemû ji bo dijînsane-tiyê ava bûne, hemû ji bo xortên wekî Cûma û zarokên ji wî kiçiktir, bêne qirkirin, ji welatê xwe bêne bidûrxistin ava bûne. Çi heyf! Ya Xwedawo ma çi bi qîma me, evdên te nayê? Çima ev dîktator û lîderên xwînrij yên ser vî erdî êdî têr nabin, çima ev agir ê pîşo natefe? Çima? Hingê min weha got di dilê xwe de. Çavên hêvîdar, awirên tirsokê bûn şûr û di dilê min de çûn xwarê. Ez ji binê pahniyan heya girê serê xwe tev de lerizîm. Xwezî û girî di gewriya min de ma. Min xwe lê rapêça û min jê destûr girt û min ev wêne hingê, di wê kêlikê de kişand. Mîna vî wêneyî gelek û gelek dîmenên din li ba min hene. Her çi wextê ez lê mêze kim, ez pir li ber dikevim: Li vê çerxa bêbext, li zalimên vê serdemê û mîna yên berê.





# destar

*Pirtûk û Kovar*

Malpera Weşanfiroşîyê  
www.destarpirtuk.com'ê  
dest bi weşanê kir

[www.destarpirtuk.com](http://www.destarpirtuk.com)







DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL  
ARAŞTIRMALAR ENSTİTÜSÜ


ENSTİTUYA DİYARBEKİRÊ BO  
LÊKOLÎNÊN SİYASÎ Û CIVAKÎ

DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL  
AND SOCIAL RESEARCH

# Koma Kovargerên Kurd

Koma Kovargerên Kurd bi hêviya kovargerên kurd bîne ba hev, bingeheke sazîtiyê bide kovargerîya kurdî, kovargerîya kurdî hem bi sewirandinê hem bi naverokê bi pêş de bibe û pirsgirêkên kovarên kurdî bi hev re çareser bike hatiye damezirandin.

## Kovarên Endam



📧 📷 📺 📖 /KovargerênKurd

✉ KovargerênKurd@gmail.com

# POPKURD

Endama Koma Kovargerên Kurd e